Taharê Biro

# Memê û Eyşê

## Şano

Enstituya Kurdî ya Brukselê

# NAVEROK


| | |
|---|---|
| Kesên şanoyê | 3 |
| Qewimandina yekan | 9 |
| Qewimandina duduyan | 65 |
| Qewimandina sisiyan | 96 |
| Qewimandina çaran | 119 |
| Qewimandina pêncan | 144 |

Taharê Biro

# Memê û Eyşê

## Şano



Enstituya Kurdî ya Brukselê

Adar 1991

D/1991/5799/2

Enstituya Kurdî ya Brukselê

4, rue Bonneels — 1040 Bruxelles

tel. 02/230.89.30

Çapxane : Acco - Leuven

Avec le soutien du Ministère de la Communauté Française - Service de l'Education Permanente

## KESÊN ŞANOYÊ

### WETÊ

Jina bî. 49 salî, bejnnizm. Dêrê mexmer, şalika qedîfe û benê binexş li xwe dike. Kofî dide serê xwe. Gorê çîl û solê reş dixe piyê xwe.

### MEMÊ

Kurê Wetê. 23 salî, bejnzirav, simbêlxwedayî. Kirasê qedîfe, şalê gewr (delingê şal dike ber goran). Di lingên wî de çarix. Xortekî kemal û destpê.

### EYŞÊ

Bûka Wetê. 19 salî, bejnbilind, guilîdirêj. Dêrê sor, qîçik, êlekê spî û sedefkirî û şalika gevez û qeytankirî li xwe dike. Di stuyê wê da morî-mircan. Gustîlka zêr di tiliyê da, guharê zîv di guh da. Gorê binexş û solê sor di pê da. Cahileke (cuhan) bi edeb û jêhatî.

## CASIM BEG

Begê gund. 56 salî, bejnbilind, birûreş, simbêlpalik. Qapût, çux-çerkezî û şalê sût li xwe dike. Qeme û qayîşa zîv li pişt. Papax li serî. Sapokê reş li pê. Merivekî durû û bexîl.

## XEZAL

Jina Casim Beg. 47 salî, bejnbilind, dêmqemer. Dêrê qedîfe, şalika mexmer û gulavtûnkirî li xwe dike. Kofiya liqav xemilandî dide serê xwe. Li zend bazinê zîv-avzêrkirî, di tilî da gustîlê zêr, bi cewher. Li pişt kembera zîv. Di stû da rextê zêr. Gorê reş û kondere, carna solê alfirengî di pê da. Meriveke bînteng, diborî.

## ŞÊX HACÎ

Şêxê gund. 60 salî, bejnorte, jar, birû, rû, simbêlbiçîl-qerqaş. Eba, çuxe û şalê reş li xwe dike. Koloz li serî. Tizbî di dest da. Di pê da gorê reş û çarix. Merivekî zarşîrîn û çavnebar.

## PÎR EMÎN

Pîrê gund. 63 salî, bejnkin, simbêlqalind, rûdirêj.

Eba, çuxe û şalê reş li xwe dike. Koloz di serî da. Hergav tizbî di dest da. Di pê da gorê çîl û çarix. Merivekî dilvekirî.

## XELÎL

Şivanê gund. 51 salî, bejnorte, simbêlqalind, rûdirêj, jar. Arxalixê kevn ê pînekirî û şalê gewr (delingê şal dike ber goran) li xwe dike. Papaxê kevn di serî da. Tûr û kîsikê titûnê pê va dardakirî. Çarix di pê da. Di dest da hergav şiv û şivdar. Merivekî dilovan û milûk.

## HACÊ

Jina Xelîl. 44 salî, bejnbilind, dêmqemer. Dêrê çît, etles û şalika lastîk li xwe dike. Hêrat dide serê xwe. Gorê kevn û şimik dixe piyê xwe. Meriveke rûken û xîretkêş.

## ETAR

Kurê Xelîl. 21 salî, bejnzirav, çepildirêj. Kirasê zer û şalê gewr û pizîkirî (delingê şal dike ber goran) li xwe dike. Hergav serqot. Çarix di pê da. Xortekî jîr

û mesxere.

## REŞO

Xalê Etar. Serdewatî, 46 salî, bejnbilind, simbêlreş. Çuxe û şalê reş li xwe dike. Qeme û qayîşa zîv li pişt. Papax li serî. Sapokê reş li pê. Merivekî dilsax û rastgo.

## ZADÎNE

Jina Reşo. 39 salî, bejnzirav, çavreş û gulîdirêj. Dêrê sor, êlekê spî yê sedefkirî û şalika qîçik a qeytankirî li xwe dike. Hevrengê dide serê xwe. Gorê binexş û solê sor pê dike. Meriveke dilfireh û ebur.

## ALMAST

Cînara (cîran) Wetê. 48 salî, bejnkin, xurt, çûr, çavsût. Dêrê çît, êlekê mexmer û şalika kesk li xwe dike. Kofiya bi qotik, carna hêratê dide serê xwe. Gorê reş û kondere dixe piyê xwe. Meriveke beşerxweş û qedirgir.

## XIŞMAN

Kurê Almastê. 26 salî, bejnbilind, simbêlçûr. Kirasê

qîçik, şalê gewr (deling dike ber goran) li xwe dike. Cirêbenda hermiş dide ser kirasê xwe. Hergav serqot. Çarix û gorê çîl li pê. Xortekî rûken û dengbêj.

## ZABITÊ ROMÊ

47 salî, bejnbilind, destpê, simbêlpalik. Kincê zabitiyê li xwe dike. Finoyê sor li serî, mawzer li kêlekê dardakirî, qamçiyê qalind di dest da. Merivekî berk û bêrehm.

## ŞEMÊ

Parsek. 59 salî, piştxwar, çavşaş. Kincê gincir li xwe dike. Destmala gewr, bi qirêj û peritî dide serê xwe. Gore û solê qelişî dixe piyê xwe. Torbê parsê pê va dardakirî û şiv di dest da. Pîreke fêlbaz û xapxapok.

## CERDAN

Xulamê Casim Beg. 38 salî, bejnzirav, simbêlreş, jar û hergav serqot. Arxalixê kevn, şalê gewr ê pînekirî (delingê şal dike ber goran) li xwe dike. Çarix û gorê qelişî dixe piyê xwe. Merivekî aqilsivik û guhdar.

MIKO

Kizîrê gund. 41 salî, bejnkin, simbêlreş, pozpîjin. Çuxê kevn û şalê reş (delingê şal dike ber goran) li xwe dike. Hergav serqot û şiv di dest da. Gore û çarixê kevn li pê. Merivekî çapik û fêde.

GUNDÎ, ERSAWILÊ ROMÊ, SAZBEND : DEFÇÎ Û ZURNEÇÎ.

# QEWIMANDINA YEKAN

*Di hewşa Wetê da govend digere. Sazbend qayda "Keleşo" lêdixe :*

Keleşo, eba tehtî,
Ser çavê min ra hatî,
Te ez kirim kewa pehtî,
Berda me vî Feratî.

* * *

Keleşo, eba dezî,
Ser çavê min ra bezî,
Te ez kirime marê tevizî.

* * *

Keleşo, pirê çêke,
Qaş bi qaş mermer lêke,
Dereng e, min verêke.

* * *

Keleşo, hişm e, hişm e,
Cehnûnga ser bi rişm e,
De tu bajo, qonax piş me.

* * *

*Wetê û Hacê li ser doşikê odê kulavan radixin, lê Almast û Zadîne firaqan hazir dikin.*

WETÊ

... YA şems, tu mirazê hevtê du miletî bikî, mirazê mirazxwaza bikî, paşê mirazê Memê min ê tayê tenê bikî.

HACÊ

Amîn .... amîn !

WETÊ

Şemso, tu ya xwe bikî, ya evda nekî ! Tu min serê sibê ve têkî nedîra Memê û bext- mirazê wî.

HACÊ

Hezar car şikir vê rojê ra, Wetê ! Bira pê-parê bûkê pê-parê xêrê be vî qapî (derî) da.

WETÊ

Şikirbûnê bîne pêşya te û kur. Xêr bi şayî (dawet) em şaya Etar û Xişman derbazkin û ewledekî (zarok) nêr jî bide Zadîne.

*Reşo û Xişman ji derve têne odê.*

REŞO

Inka (nuha), Wetê, xwendiyên me li ser hev hatine. Ew li hîviya me nasekinin, zû textê dawetçiyan hazirkin. Ka Memê ? We şand kuda ?

WETÊ

De, birê Reşo, Memê çû pey Casim Beg, Şêx Hacî û Pîr Emîn. Ew ne hatin. Nizam çima derengî ketin.

HACÊ

Çavê min biriye vê çûyîn-hatinê. Memê bela xwe dît.

WETÊ

Çavên dijminê te birijin.

XIŞMAN

Reşo, em çi sekinîne ? Gava meriv gihîşt, bira Almast û Zadîne textê xwendiya hazirkin.

WETÊ

Erê, ez qurbana we me, guhê we li ser xwendiyê we be. Kulfetê wê textê hazirkin.

RESO

Malavayê Memê, xeyîsetê wî ye, diçe ciya, derengî dikeve.

WETÊ

Birê Reşo, çima tu nizanî, yan xam î ? ... Cendekê axa û bega giran e, meta dêxin, xwe nagirin rex kesîba kevn. De, ancax ... ne sûcê Memê ye !

*Memê ji derva tê odê, hêrse-hêrs xeber dide :*

MEMÊ

Ez westiyam, ez êdî naçim pey Hala binê, ha .... ! Tu li min û wana dinêrî ! Tuê bêjî destê min di pêlawa wan da şewitiye !

*Memê dengê xwe hîn jî bilind dike :*

Inê, nizam beg, şêx û pîr çi dane te, wekî tu dibêjî here gazî wana bike. Welleh yek, bille dudu, tulle sisê, ez naçim pey wan. Diçî, here ! naçî, neçe ! Hele lê binihêre ha, hê jî ez ne heq im ! Seba wê yekê gotine : "Qenciyê bike, di mala xwe da nesekine".

RESO

Memê, hêrs nekeve lo. Cehenem gorne bavê wan ! Yê te ber şeyîkî hesab nake, tu wan qe ber qirşekê hesab neke.

MEMÊ

Reşo, ez ne yê han, yê han im. Qe tiştek nake, ez mineta xwe bavê wan nakişînim !

*Memê rûdinê, destê xwe dide ber eniya xwe û dikeve mitala.*

WETÊ

Ez qurbana te me lawo, per-baskê diya xwe ! Beşera xwe geşke, çima hêrs dikevî ?

*Wetê ber bi Memê diçe û destê xwe dibe stuyê wî.*

WETÊ

Diya te davêje ber benda aqila û tê li ser wê niyetê: dûrî ocaxa şêxa û pîra, gerekê em wana teklîf bikin. Wekî em teklîf nekin, ewê kînê xwe ji te ra bajon û zirarekê bighînin te. Were, tu li gora diya xwe bike,

lingê te li kevira nakeve. "Merî ji yarê diya xwe ra dibêje bavo !". Axir, ew serwêrê gund in, gilî-gotin di destê wan da ne. Bi wana ra qe daw-doz nabe. Tu wê yekê rind zanî : "Merî (meriv) kulmê naçe dirêşê !".

XIŞMAN

Bi heqî, giliyê inka Wetê ye. Dest neyê gezkirinê, wê bê ramûsanê.

MEMÊ

Dayê, tu ne gunehkar î. Tu rabûyî, ranebûyî, tirs di dilê te da bûye, loma jî tu wisan dibêjî.

WETÊ

Kurê min, ezê herim bi wan ra bêlomekim. Hatine, wê hatine ! Wekî ne hatin, gorne bavê wan ! De, ez va çûm.

*Wetê diçe*

REŞO

Memê, tu çima dikevî mitala ? Ber xwe nekeve, mêr

nînî, malava ! Kê hatiye ser çava, ser sera. Kê ne hatiye, bira here wêda. Rast dibêjim yan na ?

ALMAST

Welleh giliyê te ye birê Reşo ! Roja ha, hun gerekê neçin ber deriyê nemama û stuyê xwe xwar nekin.

REŞO

Eh ! Dûrî vê şayê, kambax be, dilê meriv tehemmul nake.

HACÊ

Bira Wetê û kur xweş bin, ew ne hewciyê xelkê ne. Qirêja desta ji desta diçe. Merî hewciyê hurmetê ye.

REŞO

Xuşka Hacê, xêrxwaz ew in, yên ku qesta vê şayê kirine. A, em bêy merivên usan nebin.

ZADÎNE

Kal-bava gotiye :

"Lo, mî pê xwe,

bizin pê xwe,

herkes here ser emelê xwe !".

XIŞMAN

Çi minet ! Îcar ew ji me kêm maye, em derdê beg, yan yê şêx û pîra bikşînin ! Ruhê bega tune, merî gerekê xwîna wan firke !

HACÊ

Kurê min, ya dila bira di dila da be. Dibêjin : "Saxo rê da, qelpo zerê da !".

ALMAST

Ya bega dibêjin, lê qe ya şêx û pîra navêjin. Ne, dunya wan xirav bûye.

MEMÊ

A, şîrê te mêtiye li te helal be ! Wekî şêx Hacî ne bûya, Casim beg dihat. Nizam, qe çi guha da kire piste-pist, beg nêta xwe guhast. Lê got : "Xorto, tu here. Pîr Emîn hat, dibe em bên ....". Aqilê min ne birî, ez şunda hatim. Eva jî ya min û wana.

RESO

Memoyê min ! Em dilê xwe sax in. Gerekê (divê ku) weke vê dilsaxiya me Xwedê bide me, weke dilê wan jî bide wan.

MEMÊ

Hûn min ra sax bin. Ez minetê nakşînim. Hela hê di kîsikê bega da maye, hela axirî çawa tê.

ALMAST

Çi axira bega dipirsî ? ! Axira wan ya gişka baştir e. Bi xweydana eniya we keda gundiya bûye dewletî, hirr bûye.

XIŞMAN

Nanê bavê me helal bûya, Casim Beg biketa roja reş, keda me çavê wî ra bihata, di dunyayê da me tiştek ne dixwest.

REŞO

Bîhna xwe fireh kin. Berf û bûz namîne ber tavê ... De ez û Xişman çûn, gazî dawetvaniya bikin, bira bikişin odê.

*Reşo û Xişman diçin.*

HACÊ

Almast, delala min ! Tu û Zadîne min qurbana xwe kin, nesekinin, bilez herin mala we, guhê we ser kulfet, qîz û bûka be û textê wan bixemilînin, yan na, jin devbela ne.

*Almast û Zadîne diçin. Paşê, Hacê derdana zibil hil dide û diçe. Dimîne Memê.*

MEMÊ

Hey serî, serî ! ... Te çalkim seriyo ! Tu çûyî ber deriyê Beg bona çi ? Mirin e ! Ez dîsa bê cinazê xêrxwaz û hogira nebim.

*Memê dikeve mitala, li ser kursiyê çîm rûdinê, keser li wî tê, destê xwe dide ber cênîka xwe û xwe xwe ra xeber dide :*

Ax Eyşê, Eyşê ! Min sê sala tu hiz kirî, sê sala te sê kêlê xûnê dilê min xist. Te ez helandim, maşandim ! Qidûmê çokê min birand, sewdayê serê min firand. Te ez kirim hêsîrê muhbetê. Lê, çend çê ji yên dewlemenda peyî te ketin, te mîna kara xezala xwe ne da dest, tu evd-eysan î. Te her agir, alav da

dilê wan. Te her cahaba (cewab, bersiv) dilê Memê da. Te derd min ra qazanc ne kir.

*Memê radibe, destê xwe dide navkêlka xwe, diçe û tê :*

Eh, çi bêjim ? Dayika min a kêmaqil çû pey nexêrxwazê min, yê serê xalê min xwar, bavê min serundayî kir. Ev yeka li erdê namîne, na !

Herkê tê çengê min,
xelqê bivîne rengê min !

Tişt nabe, merî emrê dirêj dighîje miraza.

*Li derva, dengê strana Etar tê, kilama "Ha gidî Narê" distirê :*

Ha gidî Narê, hay Narê,
Ha gidî Narê, hay Narê.
Navê yara min Emîn e,
Ha gidî Narê, hay Narê ...
Bavê lê kir temîne,
Ha gidî Narê, hay Narê,
Tu ji dawetê nemîne,
Reşgulî belgê darê ...

*Etar tê odê, ber bi Memê diçe û dikene.*

ETAR

A ... ha, ha ... a ... Kuro Memê, kanê Casim Begê takorî ? Ne te go : "Ezê gire-gira bînim". De giregira naynî ! Inka Wetê rastî min hat, diçû mala Beg. Go: "Memê çû pey, ne hatin".

Eh ... malşintirî, te îjar çima hişt inka Wetê here ?! Min te ra ne got neçe ! Te girte xwe, de here, a, wisan e ! Ne dinya tê li te dişêwire. Te haqas jî aqilê xwe hunda kir, korazî bûyî, çawa ne ! Tu nizanî, beg neyar e, wekû bibe dost.

MEMÊ

Etar, birîn wexta qenc dibe, meriv êşê bîr dike.

ETAR

Kal-bavê me çi xêr ji destê bega dîtiye, wekî ez û tu bibînin. Lê, ya şêx û pîra tu zanî ? Wexta xerc-xerac bûya, niha Casim Beg û çend qewazava ber derî sekinîbûn, li gef û gur : "Gelî nemeriva, vê sehetê, xercê îsal bidin !". Lê wekî ez bimirim, şêx Hacî û Pîr Emîn pêşya gişka wê hazir bin. Wexta şûştinê jî, bona palasê min, wê hev bêrûmet kin.

MEMÊ

Şêx Hacî niha kût-genimya dike û dibêje Beg : "Tu

çawa xwe digirî herî mala wî gedeyî !". Paşê ku temetîsk kete bîrê, wê bêje : "Em herin Begê min, em herin !".

ETAR

Şêx durû ne û geveze ne carna. Çima lê dibêjin : "Geveze nîn bin, mî û gur wê tev biçêrin". Eh, pêsîra me ji wana biqetya baş bû. Ewana dixwazin em qûlê wan bin.

MEMÊ

Wexta av dûr e, çetin agir vêsînî. Şêx Hacî seva du şeya quruşa êl û eşîr berî hev dane. Di ortê da sekiniye û şivka xwe li erdê xistiye û gotiye "Agir pîşo, agir pîşo !".

ETAR

Mêkutê Şêx Hacî di bin pincekê da ne. Ku pişta meriv dikeve, yek mêkut dadiweşîne. Tu çawa îtbara xwe bi wana tînî, ocaxkor ? ! Kal-bavê me gotine : "Nebe heywan, gur te naxwe". Kê silavê dide rûta. Mêş û moz rêxê dicivin.

MEMÊ

Etar, çira min ! Dara tal berê tal dide; wekî pê ava şîrîn jî avdî talbûna wê naçe. Te tirê ez haqas jî fehm nakim. Rû dibin bihust, lê dijmin nabin dost.

ETAR

Dewr xirab e. Kedkirî keda xwe naxwe.

MEMÊ

Delalê min Etar, mihîn suwarê xwe baş nas dike. Li me suwar dibin, çawa dilê wan dixwaze.

ETAR

Tu rast dibêjî. Şêx û Pîr hergav dibêjin : "Dînê me dînekî qayîm e, lê mirîd qûlê me ne".

*Li derva, ber derî, dengê Wetê tê :*

WETÊ

Keremkin, keremkin !

*Wetê, Casim Beg, Şêx Hacî û Pîr Emîn ji derva tên odê. Etar lêva xwe digeze :*

ETAR

Oh ! Begê me, şêx û pîrê me li ser çava hatine. Gurê kîjan çiya mir hûn hatin ! Welleh, Xwedê jor zane, çavê me li riya we gerimî, ocaxkim !

*Etar vedigere, çavê xwe ji Memê ra diqutîne û di bin lêvan da dikene :*

Me behsa gura kir, gur hazir in.

MEMÊ

Keremkin serê jorê.

CASIM BEG

Şayî bimbarek pîroz be !

PÎR EMÎN

Şikir vê gavê ra mirîda Wetê !

ŞÊX HACÎ

Çavê me ron Wetê ! Bi şayî em deriyê vî qapî vekin.

WETÊ

Ev şayî ber deriyê gişka be.

*Etar û Memê diçin destê Şêx û Pîr.*

ŞÊX HACÎ

Dua melektawûs li we be ...

PÎR EMÎN

Mertala şems li ser milê we be.

*Casim Beg, Şêx Hacî û Pîr Emîn fêra cimaetê ciyê xwe dikin. Dawetçî gişk bimbarek-pîroz didin Wetê û rûdinên.*

CIMAET

Şayî bimbarek pîroz be ... Mirazê Wetê li herdu gula be.

WETÊ

Li ser çava hatine.

*Reşo û Xişman ji derva tên. Paşê Hacê tê, li kêleka Wetê disekine.*

REŞO

Begê me, Şêxê me, Pîrê me, cimaet gişk li ser çavê me hatine.

CASIM BEG

Em bêy mêrê nolî te nebin. Tu mirazxwaz î, miraza dighînî hev.

REŞO

Casim Beg, ez xulam. Li ser çavê min, li ser serê min hatî. Em pêy cimaeta xêrxwaz nebin.

ŞÊX HACÎ

Reşoyê min, Xwedê te ji adetê kal-bava nede şermê. Gundê şên, beraya rê va kivş e.

REŞO

Ez xulamê te me, kek Hacî ! Cimaet kasê xwe dagirin.

*Reşo kûzikê şeravê hil dide, kasa xwe dadigire û dua dike :*

Cimaet ling-ling, pê-pê li ser çava hatine. Şayîke weha li ber deriyê we be. Lazim e em merivekî

kivşkin, serwêrtiya textê şayê bike. Ez vê kasa çûk bi dilê mezin hildim, vexwim, eşqê kekê Şêx Hacî, wekî serwêrtiyê bike, gula cimaetê ra roke. De eşqa we, kekê Şêx Hacî !

XIŞMAN

Weke sozê Reşo ye. Kasê xwe hildin, mirazê me vê şayê be.

*Reşo şeravê vedixwe û kasa xwe datîne.*

ŞÊX HACÎ

Xêrlû be Reşo !

REŞO

Xulamê ocaxa te me ...

*Cimaet dua Reşo dike :*

CIMAET

Reşo, li te sehet be ... Ya te vexwar şerbet be ...

RESO

Zehf razî me,
sehet ezîzê we be ...
şerbet kaniya spî be ! ...

*Herkes bi sirê kasê şeravê vedixwe.*

ŞÊX HACÎ

Li vexwariya xêrlû be ! Cimaet tam e ?

CIMAET

Tam e, tam e ! ...

ŞÊX HACÎ

Xwedê sehetê bide we. Gişk xêrê ji kasê xwe bivînin. Şikir, saya serê xuşka Wetê û kur, texte têretijî ye. Bixwun, vexwun, reng di we da bê. Xuşka Wetê ! Rebbê alem ve kiranînê bimbarekke, pîroz be. Herdu gulê te li ser belgîkî hevra kal-pîr bin, berê wan te bide xwarinê.

WETÊ

Herdu gul xulamê mala şêx in. Bira Xwedê me bê

şêx û pîrê me neke. Padişê-padişah nanê kal-bava bide we, we şêx bihêle, me mirîd bihêle. Bira ocax nebin bûcax ! Bira toqê dîn ji stuyê me derneyê.

ŞÊX HACÎ, PÎR EMÎN, CASIM BEG, CIMAET

Amîn ! Amîn ! ... Amîn ! ...

CASIM BEG

Em bê hosta û merebî nebin !

PÎR EMÎN

Hesinê xas him dibe tevr him das. Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e. Welleh ez ya Wetê ya diya nadim. Wetê ji diya meriya çêtir e.

WETÊ

Ez xulama diya we me.

ŞÊX HACÎ

Xuşka Wetê ! Welleh serê kekê xwe kim ! Gava min bihîst wekî daweta Memê ye, şabûna lingê min erd ne girt. Di orta min û Xwedê da bihustek erd ma.

WETÊ

Ez ji we bawer dikim. Xwedê seheta we ra be. Ji sehet-qewetê mehrûm nebî.

ŞÊX HACÎ

Reşo, ellawekîl merîkî hêja yî, tayê te mêr tune.

CASIM BEG

Li ser bextê min be, qisûra wî tune.

PÎR EMÎN

Ez vî nanî kim, usa ye !

ŞÊX HACÎ

Reşo, mertala şems ser milê te be. Bi rastiya Xwedê silsileta kal-bavê te li ber millet miqabilî neyara xûn rêtin. Mêrxas bûn ! Ne axir tu ji wê silsiletê yî. Bira ferasetê kal-bava bide te û hertim serkarê daweta bî.

PÎR EMÎN

Şêx, tu çiqa giliya dirêj dikî !

ŞÊX HACÎ

Neyarê hineka dûr in, y ê min ber pozê min radibin. Pîr, wekî tu xeber nedî tuê biteqî ! Cimaet, zehf razî me bo vê kasê. Çiqe hilda û vexwar eşqa min.

*Şêx Hacî vedixwe, rûdinê û çavê xwe li Pîr cinû dike.*

CIMAET

Kekê Şêx Hacî, xêrlû be ! ... We sehet be ...

REŞO

Hîvîkî min li we heye, yek xeberdide, yê din bira li ber giliyê wî neyê.

*Casim beg kasa Şêx Hacî tije şerav dike. Şêx radibe, xeber dide :*

ŞÊX HACÎ

Li vexwariya xêrlû be. Dua Xwedê li we be. Kasê xwe dagirin. Kê bûn sebeb ku îro em hazir in ? Ehse, herdu gulê me ! Em hevra vê kasê hildin, vexwun eşqê herdu gula. Bira ew gul bin, neçilmisin, li ser belgîkî kal û pîr bin. Reşo ! Cewaba herdu gula tu didî.

RESO

Belê, ez xulam !

ETAR

Kek Şêx Hacî, îznê didî Xişman bistirê ?

ŞÊX HACÎ

Îzn e, îzn e ! Dengbêj gula cimaetê ne.

ETAR

Xişman, cê kilamekê warê ...

*Xişman kilama "Elî Xarziya" distirê :*

"Siba me sibeke şîrîn e,
Êla me êleke rengîn e,
Li deşta Makûyê daniye,
Hemze û Temo, Huca xanim kon da rûniştî ne,
Ûsibê Carê fîncanê qawê digerîne,
Fîncanekî ber Huca Xanimê datîne,
Huca Xanim destê xwe lê dixe,

Fîncana qawê werdigerîne,
Dibêje : hûn mal da rûniştîne,
We haj êlê tu nîne,
Heja yalê malê bûm, peyak hate
Yalê malê, min go :
Peyayo çi heye, çi tu nîne ?
Peyê go : Ez duh li Makuya jêrîn bûm,
Li Makuya jorîn bû qûtîne,
Bînbaşê Romê bi sed mêrê romê va,
Bîst û çar girtî girtiye,
Destê wanî li kelemçê ye,
Lingê wanî li qeydê ye,
Stuyê wanî li lelê ye,
Xortekî nav dane, navê wî Elî ye,
Bînbaşê Romê rojê sê cara dikute,
Kêlek-kêlek werdigerîne,
Gotiye : "Ezê berê wî bidime taşxana
Ezurma rengîn e,
Kê taşxana Ezurmê li çavê xwe bivîne,
Êdî xêra wan ji xwediyê wana ra tu nîne".

CIMAET

Dengî dinê be ! Tew .... Tew .... Dengî xweş !

ETAR

Can ... Can ... Ez heyrana te wî dengî !

*Xişman dengê xwe dibire.*

ŞÊX HACÎ

Em bêy seda te nebin, Xişman ! Dengê te me ra, kerema Xwedê te ra.

*Şêx Hacî kasa xwe ya şeravê vedixwe.*

CIMAET

Kekê Şêx Hacî, te sehet be ... Xêrekî lê bivînî ...

CASIM BEG

Xêrlû be şêxê min.

ŞÊX HACÎ

Ez bê qedirê te nebim, û gelek ji cimaetê razî me.

ETAR

Kekê Şêx Hacî, "Av li nik !".

ŞÊX HACÎ

"Nîşanê mêra kulik !".

ETAR

Ya we vexwar şerbet be !

ŞÊX HACÎ

Şerbet kaniya spî be !

ETAR

Ya we vexwar av be !

ŞÊX HACÎ

Dureke enzel nav be ! Kurê xele rûtik, çi ? Tu min dicêrbînî ? Tûle !

REŞO

Ewî qelet kiriye !

CASIM BEG

Em bêy gilî-gotinê Şêx Hacî nebin. Ulmê der-dunê zane.

ETAR

Ya wan, ser belgî gihîştiye wan.

CASIM BEG

Etar, te ra divêm dengê xwe bibir ! Şerm e ! Fesal be, fesal !

PÎR EMÎN

Kurê Xelîlê me xortekî serwaxt e, mirazê dê-bavê lê bike, lê kul e kul ! Ha bêje, dîsa ya xwe dike. Dibêjin : "Defa ber keran e, çira ber koran e".

HACÊ

Etar lawo, xeberê xwe bipêj, paşê birêj.

CASIM BEG

Ew şipûk e, şipûk !

WETÊ

Etarê min, mezin mezin gotî, çûk çûk gotî. Edeba xwe da xwe bigire, qedirê şêx nekeve.

ŞÊX HACÎ

Cimaet, hema gilîk ji devê wî derê, emê çepilê wî bigirin, pişt derî xin.

REŞO

Kekê Şêx Hacî tewaqe dikim neve dilê xwe. Cahil e, ber we zêdezimanî kiriye, bibaxşîn.

PÎR EMÎN

Yekî mîna Casim Beg, wek çiyakî nav me da rûniştiye, gerek cahil ber mezina xeber nedin. Qedir heye bo navê Xwedê. Zimanê wî rojekê wê bive bela serê wî. Ser xeysetê wî mirdar, kes qîza nade wî, wekî serpê da zîr be.

CASIM BEG

Kê wê mala xwe xirav ke, ocaxê xwe kor ke, qîzê bide wî ?

ŞÊX HACÎ

Wekî bidin jî, roj-denekê cam nasekine.

MEMÊ

Serî habin, kum zehf in !

ŞÊX HACÎ

Dibînin çawa pişta hev digirin. Lêv ji dirana pêştir in !

PÎR EMÎN

Şêx, bes e da ! Reşo ser darê piya sekiniye, bihêlin bira cewabê bide.

ETAR

Çima hêrsa xwe tînin ? Pêla li min nexin, gilya ji min dernexin ! Cimaet ! De hûn ser heq, neheqiyê da dinihêrin, Şêx nifira dike. Eh, nifirê wî çi bikin ? Çawa dibêjin : "Bira Xwedê yar be, evd neyar be !".

PÎR EMÎN

Kuro, Etar ! Tu ne layiq kur î ! Te çi bihîstiye ?

Erebî û farisî li me dixurî. Tu zanî, jehra mara ji mara naçe ! Ne, axir hêja gotin te : "Giliyê xwe bipêj, paşê birêj".

ETAR

Gelî cimaet ! Min tiştekî xirab ne gotiye, xwe ez ne zar im, ne jî gede.

CASIM BEG

Çi ne gede ye ! Tu lingê xwe, guhê xwe dixî. Mişk çiqa xweliyê bikole, hewqa jî nav çavê xwe dike.

PÎR EMÎN

Ha bêjin, defa ber karan e, çira ber koran e !

ŞÊX HACÎ

Meriv bê vir, devê xwe bide ber devê geda-gûda, parsekçiya, wê çi lezetê bibîne ?

ETAR

Giliya pozika sola xwe ra bêje. Pars şêrê Elî da bûye. Lê hetabeg hebin, emê ha kesîb bin.

CASIM BEG

Bala xwe bidinê, giliyê çawa ji dev dertên. Tuê zimanê xwe bibirî, yan na ? ! Ez ku rabûm, ezê dîwana te bikim !

REŞO

Kuro Etar, çira ? Min bihêle ez cewaba xwe bidim.

PÎR EMÎN

Ew yekî teşqele ye. Reşo kasa şeravê hildide, dua dike.

REŞO

Kekê Şêx Hacî, ez xulamê we me, destê we radimûsim. Pîr Emîn, Casim Beg, cimaeta hazirî ser çava ra hatiye. De, Etarê me ye, hûn pak haj xeysetê wî hene. Hûnê bibexşînin ! Giliyê wî dilopê baranê ne. Bi dilopê baranê behr tijî nabe. Bidin xatirê navê Xwedê, nevne dilê xwe. Wek sazê.

CASIM BEG

Hela bêje, tuê çi bêjî ?

ETAR

Rastî dikare bê tevandin, lê nayê şkênandin. Lê dibêjin :

"Bende li dunê tijî ne,

Destek zêra dicivîne.

Têra haj birçiya nîne".

Ev mesele rast e, derew nîne ! Bavê min, Kesîb, wê ji kê derê qelen destxe, min bizewicîne ? Hûn dihêlin em çavê xwe vekin ?

XIŞMAN

Wekî hûn ser rastiyê ne, qelen bidin hildanê. Bira qîzêd can, xortên teylan bi dilê xwe bizewicin. Ne pêşiya gotine : "Qelen nabe war, kesî qelen têr ne xwar".

ETAR

Bira, lo ûrt li qelen biqele ! Wekî ser miletê kurd bûye teşqele !

*Casim Beg li ser Etar û Xişman hêrs dikeve :*

CASIM BEG

Lo mirazê we çavê we da bimîne ! Kê îzin da we hûn ber mezina xeberdin ? Loma dibêjin : "Golikê malê, gayê malê natirse". Ev mesela we ye.

ŞÊX HACÎ

Xeta ji wî tê. Ne xazil wê be, kê jê xeberde ! Jehra maran e ! Xeta ji wî tê. Xelîlê bavê wî milahîm e, ew ji kê çûye ?

REŞO

Etar ! Te ra divêm dengê xwe bibir. Merî lingê xwe ku şimitî, tê ber xwe; lê zimanê xwe ku şimitî, nayê ber xwe.

ETAR

Min giliyê te qebûl kir, Xalê Reşo. Dibêjin : "Navê gur derketiye, rûvî dinê xirav kiriye". Ev mesela min û wan e.

ŞÊX HACÎ

Ez çi bêjim wî, dilê min rehetbe ? Belkî risqê wî

ser pişta xezalê be, ew bibeze nebeze pê ra negihîne! Vê zêdetir, ez çi bêjim ?

ETAR

Rûto, çi vî alî avê, çi wî alî avê !

REŞO

Ezê ji te bixeyidim, Etar. Gilî dan te, paşê xeberde. Şêxê me, ezê vexwum eşqa herdu gulê me. Bira ew mirazê xwe şabin, tu derda nevînin.

*Reşo kasa şeravê vedixwe.*

ŞÊX HACÎ

Xêrlû be ... Xêrlû be Reşo !

CIMAET

Te sehet be ...

REŞO

Sehet ezîzê we be ... Hûn ronahiya çavê min in ...

PÎR EMÎN

Reşoyê min ! Cimaet ! Ez giliyê xwe dirêj nakim. Cahil gotî bizanibin, wekî giliyê şêxê we, pîrê we, begê we, ser giliyê mezinê wana ne . Beg bavê êlê ye, lê şêx û pîrê we kêra ruhê êlê ne. Ew jî qirara rebê jorîn e, ku yek beg e, yek xulam e, yek şêx e, yek pîr e, yek mirîd e, yek dewletî ye û yek kesîb e. Cahil gerekê bin qolê mezina da bin, lingê wan kevira nakeve.

XIŞMAN

Çima mezin zanin, cahil nizanin ? Ew cahil heye mezina zêdetir zane. Lê çima dibêjin : "Rûvîkî geryayî şêrekî ketî çêtir e" û "pirsa bikin xortê geryayî, kalê zemana" ?

ŞÊX HACÎ

Mezin, weke pirça serê we cahila, dunya dîtine û giliya zanin.

HACÊ

Ruyê min bin pê we be, rûreşî tê ku ez kulfet xeber didim. Cahil xulamê wan e. Bi xeberê wan doza bilind nizm nabe. Em xêrxwaz in. Agirê xêrxwaza meriv naşewite.

PÎR EMÎN

Xuşka Hacê ! Gotina gotiya : "Dewsa xencera sax dibin, dewsa xebera sax nabin".

CASIM BEG

Ez zanim çi dilê wana dişêwire. Kirasê meriya tê guhastin, lê xeysetê meriya nayê guhastin. Ruyê wan çermê gamêşan e !

PÎR EMÎN

Eh ... Ez çi bêjim ! Cahil gerekê qedirê mezina bizanibin. Dinya mêvanxane ye, bende jî mêvan.

*Xelîl çomax û şiv di destan da, ji derva tê hundir.*

XELÎL

Êvara we xêr, cimaet ! Şayî bimbarek-pîroz be, bira hevra kal û pîr bin. Xuşka Wetê ! Hezar car şikir vê rojê ra, tu berê wana bixwî.

WETÊ

Bi xêr û şayî em şaya kurê te jî derbazkin.

CIMAET

Ser çava ra hatî, Xelîl ! Keremke ... Keremke ...

XELÎL

Xwedê çavê we xweyke, kerema Xwedê we ra be.

ŞÊX HACÎ

Cî bidine mirîdê min Xelîl.

*Cimaet xwe ser hevda dide. Xelîl rûdinê.*

ETAR

Bavo, çima derengî ketî ? Eva wextê te ye ? ! Loma dibêjin : "Yê hîvya yarê kurdûn da ye". Ew mesela te ye.

XELÎL

Lawo, de ancax. Çima tu pirûka bavê xwe nizanî, yan ne beled î ?

PÎR EMÎN

Kuro Etar, te bavê xwe teze dîtiye ! Kerb e tûle, yekî çi netevîtî yî.

ETAR

Ya bi xêr ! Çima ez dengbirî me ? !

ŞÊX HACÎ

Cahilekî çi mirdar e ! Min gazî Xwedê kiriye, tu mirazê xwe şa nebî. Vê zêde tiştek nabêjim te.

*Etar dikene :*

ETAR

Kekê Şêx Hacî, seva çi nifira min dikî ? Min bêhurmet dikî ?

*Dibe qîrqîniya gişka. Casim Beg li ser Şêx hêrs dikeve :*

CASIM BEG

Emrê min pîr çû, yê hindik ma. Min ecêbê weha ne dîtiye. Şêx, ez ne dihatim. Te çi serê min kir ? Te ez anîm kirim hevalê geda-gûda, rût-tûta. Kera bal kera girêdin, wê bîna tir-fisa wan bê. Ker dizire, hevsarê xwe va diçêre. Kê gura (li gora) we şêx, pîra bike poşman e.

PÎR EMÎN

Hêrsa xwe raneke Begê min ! Bizina nehs, şivanê topal, tev diçin guhêrê.

REŞO

Cimaet ! Şêx Hacî ! Dibêjin : "Diya kêlmê ziman e, bavê xebera aqil e". Kasê xwe dagirin, terka wan giliya bidin.

ŞÊX HACÎ

Ez bêy serê te nebim, Reşo ! Deqekê ! Casim Beg, lo ! Topek-topa ezman nav çavê pîr xe ! Ne, axir te rakire ser rê. Ez ne neheq im. Werin, vê ecêbê binihêrin : "Yê kirî xilaz bû, yê ne kirî ket demanê".

WETÊ

Hîvî dikim, nekevin hucetê. Şikir dawet e, bistirên, kêfkin û roja xweş nedin roja reş.

ŞÊX HACÎ

Wetê ! Xwedê ya heq nede ya ne heq. Û kula kor bikeve qapiyê pîr. Seva wî, beg hilmeyî min bû.

PÎR EMÎN

Şêx, maşale, maşale te ra ! Te dîsa mêkutek li qafê

serê min xist. Tu mar î. Gava pişta meriva dikeve te, tu li meriya vedidî. Tu çiqas ser erdê yî, ewqas bin erdê yî. Merî destê xwe da hêkerûnê bide te, tuê bêjî : "Devê min şewitî, destê te na". Merî ber te here yek e, piştre here yek e ! Tu dost û dijminê xwe nas nakî. Te tirê tirê ez dijminê te me, malwêran !

*Xelîl bi nermî bi Reşo û Xişman ra dipeyive :*

XELÎL

Ewana anqesta usa dikin.

*Şêx li ser Pîr Emîn hêrs dikeve :*

ŞÊX HACÎ

Pîro, belkî kula hevt-pênc te derê ! Min çi got ? Te ez bêhurmet kirim.

REŞO

Ya ... Ya ... ! Gelî kalmêra, we çi bihîstiye ?

CASIM BEG

Hû ... û ... Kevirî qulîb e ! Dest sewta we çîk kete serê min.

XELÎL

Bes e ... Bes e da ... !

CASIM BEG

Hela min li vî binêre ! Hirç û govend.

ŞÊX HACÎ

Xele rûtik, sebebê şer-dawê me bû kurê te yî ne tiştek. Te xirav hîn kiriye, belkî zarê wî zikê wî da here !

XELÎL

Ez wê ya ... teze hatime. Haj we çi heme ?

ETAR

Tu şêxekî zewal, wê derbaz bin sal, ji wê dunê cehenemê da jî nabî sitar. Bizanibe hewalê dunê !

*Casim Beg li ser Etar hêrs dikeve :*

CASIM BEG

Lo ... Destê te devê te keve. Derkeve derva, çavê min te nekeve !

ETAR

Giliyê min çima jehr in, usa zû li we girt ?

ŞÊX HACÎ

Bala xwe bidinê ! Merî tirê kirasê wî devê mara kişandiye.

PÎR EMÎN

Mirazê te biqurmiçe, bes e, we serê me kire dew...!

WETÊ

Ya şêx û pîra Heleb safî dike. Şêx, ne axir tu temade yî ! Çima textê min li hev dixî ? Min hûn

teglîv kirin bona şayê, ne ku hûn şer-dawa bikin. Terka giliya bidin. Etar ! Dengê te dernayê.

ETAR

Inka Wetê, min qelet kiriye.

PÎR EMÎN

A ... Usa, kûçik ! Were yolê, da ...

ŞÊX HACÎ

Eh ... Ez çi bêjim ? Xwedê ya heq nede ya ne heq ! Kasê xwe dagirin.

*Şêx Hacî kasa xwe hil dide, dua dike.*

REŞO

Cimaet ! Guhdarî.

ŞÊX HACÎ

Cimaet ! Ya dila bira dila da be.

WETÊ

Mêr gotî giliya daqurçîne.

ŞÊX HACÎ

Xûşka Wetê, bona xatirê we û vê şayê emê daqurçînin.

PÎR EMÎN

Şêx bes e. Giliya dirêj neke. Etar ker bû, lê tu giliya dirêj dikî.

ŞÊX HACÎ

Hala min û vî pîrî dinihêrin ! Pîr, zerika şems te keve, kasa xwe dagire. Evê kasê ezê hildim, vexwum eşqa dê-bavê bûk û zavê. De cimaet, em bêy hev nebin. Cewaba vê kasê cem Reşo ye.

*Şêx vedixwe.*

REŞO

Te sehet be, kekê Şêx Hacî !

CIMAET

Xêrlû be ... Xêrlû be ...

ŞÊX HACÎ

Ez bêy serê we nebim. Xêrê li seheta xwe bivînin.

*Kas di destê Reşo da, Xişman dest bi kilama "Heylo kalê ... " dike û distirê :*

XIŞMAN

"Heylo ... Heylo ... Weylo kalê.
"Keçika êzdî digot :
"Heylo lo .... kalê, bengî, ha bengî,
Du dezmal e serê kalê bûn,
Herdu jî qawerengî.
Bextê îmana te me,
Wekî ramûsanekê nevsa canê min dikî,
Nava heval, hogira da neke dengî.
Heylo ... Heylo ...

Weylo kalê ....".

Kalê digot :

"Keçika êzdiyê, nav li Gewrê.

Qirar-qesemê Xwedê be,

Wekî ramûsanê nevsa canê te keremkim,

Nav sîng-berê ranabim,

Heta dunya şên e,

Heta axirya dewrê ...

RESO

Ez heyrana te wî dengî !

ETAR

Canê, canê ... Dengî xweş !

CIMAET

Dengî dinê be ! Çi sedake xweş e, seda rehmetiyê bavê ye. Tew ... tew ... û gul bî, neçilmisî !

*Xişman dengê xwe dibire.*

ŞÊX HACÎ

Em bêy seda te nebin, Xişmanê min. Cimaet tam e?

CIMAET

Tam e, tam .... !

ŞÊX HACÎ

Reşo, keremke !

*Reşo kasa xwe hil dide, wekî dua bike. Nişkva, dengê def û zurnê tê sekinandin. Lezelez, bi hilke-hilk, Cerdan û Miko ji derva têne odê. Gişk rûr dibin, li wan dinihêrin.*

CASIM BEG

Ya .... a, ya ... ! Kuro, we xêr e ? Dibek (dibe ku) gura daye pey we ?

MIKO

Begî xweş be, em hatine dû we.

CERDAN

Begê min, ez xulam, zabitê Romê û qewazava mal da hîviya we ne.

CASIM BEG

Cimaet, Reşo, Wetê, îzna we hebe ez rabim, herim, hela min û zabitê Romê çi dest dide. Seba çi gazî min dike ?

PÎR EMÎN

Ez ser va diçim, seba çi Zabitê Romê hatiye. Her sal, van çaxa, fermana dewletê derdikeve, seba cahilê me ku bivin eskeriyê, eskeriya Romê. A, hûnê giliyê min bicêribînin.

CIMAET

Xeberê pîrê me ye. Pîr rast dibêje.

*Cimaet li çavê hev dinihêrin.*

REŞO

Casim Beg, keremke, we ra îzn e.

*Casim Beg radibe.*

XELÎL

Rê bidin Casim Begê.

PÎR EMÎN

Gelî mirîda, çima spîçolkî bûne ? Kirasê mêra li we ye, xwe kirasê jina na ! Rabin, herin, haj hev hebin. Bira Wetê ber xwe nekeve. Casim Beg xwe ne perîkî biçûk e. Wekî tiştekî usa hebe, dest nadin Memê.

REŞO

Eniya meriya çi nivîsiye, wê wê bivîne. Bira Xwedê yar be, evd neyar be !

*Casim Beg diçe, Şêx pey dike gazî :*

ŞÊX HACÎ

Mirîdê Casim, mirîd ! Bisekine, em tev hatine, tev jî herin.

*Casim Beg pişta xwe nazivire, diçe. Hêrsa şêx radibe, dide dû Casim Beg. Pîr jî dide dû Şêx.*

PÎR EMÎN

Rê bidin min, rê !

*Pîr dawetvanekî dehf dide.*

DAWETVAN

Hû .... û, kevirî qulîb e ! Çima min dehf didî ? Tuê herî, here ! Wê rê ber te, Xwedê ser te !

PÎR EMÎN

Mirîd, çima dilê xwe dikî ? Rê bide min, da !

*Pîr diçe. Cerdan dide dû wan.*

RESO

Gelî xêrxwazno, cînarno, hûn dizanin, çiyayê bilind nikarin rêbir bidin ewra. Ewan çûn, bira herin.

XELÎL

Weke emelê wan, bira bê pêşiya wana. Topayî ne avîtin, usa çûn.

HACÊ

Ewana digeriyan, mana ji wan ra jî hat. Destê wan don e, bira serê xwe xin.

*Cimaet topayî dikin gazî.*

REŞO

Bira xeyda Wetê ji cimaetê tune be. Zabitê Romê xêrê ra ne hatiye. Lazim e destûra cimaetê bidin, wekî herin, haj malê xwe hebin.

WETÊ

Birê Reşo, îzna cimaetê bide, bira bela bin malê xwe. Qeda-belê dunê çi hene tê serê min mehrûma Xwedê. Çi bikim !

HACÊ

Tuê çi bikî ? Tu xwe naçî şerê Xwedê.

CIMAET

Wetê, Reşo, Memê, dilê xwe xirav nekin. Îzna we hebe, em rabin, herin. Şeva we bimîne xweş.

WETÊ

Xêr hatine, silamet herin.

REŞO

Oxir be ... !

MEMÊ

Oxir be, oxir be ... !

*Cimaet bela dibe, dimîne Xelîl, Etar, Hacê, Xişman, Reşo, Miko, Wetê, Memê.*

WETÊ

Ax gidîno, ez bextê we me, sal tê ser salê, eva zulma li dunê hilnayê. Zabitê Romê xêrê ra ne hatiye.

HACÊ

Miletê me ketiye bin qamçî û nîrê giran. Dunya bûye gur. Êh, Xwedê xiravke vî zemanî, ne tu zeman e.

REŞO

Dawek heye. Tirk zehf in, ser me hêrs û gef in. Çawa kêr bidî penîr, stuyê me da danîne nîr.

XELÎL

Lema dibêjin : "Ro diçe, qeda naçe".

MIKO

Ezê herim mala Casim Begê. Min çi bihîst, têm

dibêjim we. Ez va çûm.

*Miko diçe.*

PERDE

# QEWIMANDINA DUDUYAN

*Zabitê Romê û qewazava di oda Casim Begê da rûniştine, belgî li ber pala wan e. Zabit qure-qure qulapa cixarê dixe. Casim Beg, Şêx Hacî û Pîr Emîn ji derva tên odê. Silavê didin Zabitê Romê. Paşê, Cerdan kere-ker tê li binya odê disekine.*

CASIM BEG

Selam elêkûm !

ŞÊX HACÎ Û PÎR EMÎN

Selam elêkûm !

ZABITÊ ROMÊ

Elêkûm selam ! Keremkin.

*Casim Beg rex Zabit rûdinê, lê Şêx û Pîr pêşber.*

CASIM BEG

Xwedê xêr bigerîne, hûn xalfînê vê êvarê ?

ZABITÊ ROMÊ

Şikir me xêr e. Em ne mêrê xalifandinê ne. Bi hukumê dewletê em gundê we qesidîne. De, em her sal qesta gundê we dikin, wê yekê hûn rind zanin.

CASIM BEG

Lo, hûn ser çava ra hatine. Xwedê xêrke, xêr bigerîne.

PÎR EMÎN

Bibexşînin, ew çi hukum e ?

ZABITÊ ROMÊ

Hûn baş zanin, wekî her sal em cahila dibin eskeriyê. Berbangê, îş gerekê biqedînin. We fehm kir ?

ŞÊX HACÎ

Belê ! Me fehm kir. Em we bê qedir verê nakin. Dixwazin îşev dest pê bikin.

*Şêx simbêla xwe tîmaz dike.*

CASIM BEG

Lê, em bendî çi ne ? Emê wî borcî biqedînin. Serê me mû ye ber dewletê !

ŞÊX HACÎ

Cahilê me borcdar in, qulix bikin. Û dema lazim bû, bira ruhê xwe jî bidin.

PÎR EMÎN

Şêx, tu timê xwe nav giliya ra dikî. Kê te dipirse ? Begê me mîna çiyakî vir rûniştiye, dewsa wî tu xeberdidî. Ka ? Kanê cahil ? Merî hawqas jî derewa dike ? Na axir, derew dijminê Xwedê ne !

CASIM BEG

Canim, hûn çi nesitirî ne ! Top mala we keve, zarek we çêtir e.

PÎR EMÎN

Kambax be da, giliyê xirab dilê min hil nade.

ZABITÊ ROMÊ

Gotina we naha çi ye ?

CASIM BEG

Qet ! Guh nede wan. Sibe tê, xêr pê ra.

ZABITÊ ROMÊ

Giliyê Pîr Emîn min xweş nayê.

CASIM BEG

Guh nede Pîr. Ew û Şêx carna bê fehmî xwe xeber didin. Ez bêjim dibe hûn bawer nekin. Nîvê ehlê gund koç kirine, çûne zozana.

PÎR EMÎN

Ez wî dînîkim hûn dihebînin, welleh usa ne !

*Zabitê Romê hêrs dikeve û fincê xwe fireh dike :*

ZABITÊ ROMÊ

Ez ji we fehm nakim ! Yek dibêje : "Koç kirine". Yê din : "Ka, kanê ? ...". Ji we her yek xwe ra gilîkî dibêje.

ŞÊX HACÎ

Hêrsa xwe raneke, Xwedê ji we razî be ! Derew ne pêşê min in. Cahila zehftir çi heye !

CASIM BEG

Şêx ! Te dîsa virek kir nav ruya ! Tu hawqas xwe dideyî, ka bêje, hela kê ne ? Ji wê xeberdana te Zabitê Romê tiştekî din wê bive dilê xwe.

ŞÊX HACÎ

Mirîd, çima tu me'na min digirî ? Ez xwe ne zar im, qedirê min dikevî. Her kes, weke dilê wî bide wî. Çima te ne dît, dawetê da çi serê me kirin ? Ha zû bîra te çû ? Mecela wan bê, ewê me pêpeskin. Însan gerekê kûr-dûr bifikire. Ez kula xwe zanim, lema jî usa xeber didim.

ZABITÊ ROMÊ

Casim Beg ! Qedirê Şêx nekeve, ew rast xeber dide. Wekî tu gora wîna da bî, kulekê ji te kêm be.

PÎR EMÎN

Êh ! Efûkin. Evdê serreş zû serê xwe kevira dixe. Kî gora wî bike, deh kul li meriya zêde dibe, û herdu linga va dikeve agir. Ew merîkî qelp e. Ew agir hildike serî, him jî binî.

ZABITÊ ROMÊ

Kerb e ! Bes e ! Wekî ez te rezîlkim, xwe ne neheq im ! Şêx navê gişka yek-yek hilde û bêje netirse.

PÎR EMÎN

Bira Şêx aqilê xwe bicivîne ser hev !

ŞÊX HACÎ

Min aqilê xwe zû da civandiye ser hev. Ezê navê gişka jî bêjim, wekî tu bêyî û biteqî.

CASIM BEG

Heal bêje.

ŞÊX HACÎ

Bêjim ! Kurê Almastê, kurê Xelê rûtikê, kurê Wetê, yê Delo, Mûsa; Feyzo, Baso, Elî .... Kê bêjim, kê ne bêjim. Îjar sir ya we ye, hûn ser da zêdekin.

PÎR EMÎN

Lo, qapiyê te deverû be, şepe vir-derewê te xe. Te çi kîna zurretê mirî da girtiye ? Kurê Almast, Wetê, Xelîl, em wê da dayinin. Lê, yê din tev pê da zar in, emrê wana nagihîje eskeriyê, bejnê wana rewandî ye. Qey min go, wê navê kê hilde ? Eh ... Merivê bêy zurret derdê cegerê nizanin.

ŞÊX HACÎ

Zurretê vê sirê jî ? !

PÎR EMÎN

Pişt te nabêjim, lê ber te bêjim : Bira Xwedê xweş

bê, evda xweş neyê. Tu mixenet î ! Ne tu bi ked û kedewa milê mirî da newqê te ji hev rabûne, naha jî dû wana ketî. Wekî mirîd van giliyê te pê bihesin, wê belakî te ra bînin. Tu haj wê yekê heyî yan na ?

CASIM BEG

Gelî tereqa, we mejuyê me kire dew. Dest xeberdana we, ez berşşoşkî dibim, hûn zanin yan na ? We çi bihîstiye ?

ŞÊX HACÎ

Beg, ez dibêjim, wekî Zabitê Romê bê qedir verê nekin. Lê, Pîr Emîn dixwaze me berî hev de. Bira Xwedê ya wî neke. Ew peyî min ketiye, wê Xwedê jî pey wî keve.

PÎR EMÎN

Lo, kilîta reş derê te keve, kê pey kê ketiye ? Kê pey kê ketiye, bira birûsk sêmîka wan xe !

ŞÊX HACÎ

Amîn !

CASIM BEG

Pihîn we keve, ker bin ! Bihêlin ez xulamê xwe serwaxtkim. Cerdan, Cerdan !

*Cerdan tê, li ber disekine.*

CERDAN

Lebê, Begê min !

CASIM BEG

Nesekine, mehelê gund bigerî, kê xweyî cahil in bira nesekinin werin mala begê te. Bêjî Zabitê Romê we dixwaze.

*Li ber derî dengê Miko tê :*

MIKO

Cerdan, Cerdan ... !

CASIM BEG

Kuro Cerdan, gazî wî êtîmê heram ke.

*Cerdan gazî Miko dike. Miko ji derva tê hundir.*

MIKO

Evara we xêr.

CASIM BEG

Kuro, kurê Mistereşkê, tev Cerdan here hemû mala bigerin. Ewê te ra bêje.

MIKO

Belê, Begê min !

*Cerdan û Miko diçin, lê Şêx pey wan dike gazî :*

ŞÊX HACÎ

Zû herin, zû werin. Malekê pist bernedin. Of ! Canê

min usa giran bûye, kivş westiya me. Bira lingê min bişkesta, ez neçûma daweta wî tûleyî. Heyî, tu ser çava ra hatî, Zabito ! Ba-bagerê te anî ? !

CASIM BEG

Şêx ! Tu mêrê kulê yî, melekê mewtê yî. De, wê me şandiye dû wana, bira dilê te rehet be.

PÎR EMÎN

Penca dilê wî danayne, heta cahilek ber çavê wî digere. A, ew merîkî wusan e.

ZABITÊ ROMÊ

Giliyê te min xweş nayê, Pîr ! Kivş e, Şêx Hacî dilsaxê dewletê ye. Şêx, ezê te raçavkim.

ŞÊX HACÎ

De, ew jî bira Xwedê bizanibe ! Mirîdê Casim, bi kerema xwe, gazî Xezala xûşk bike, bira çeqilmastekê çêke, bîne, ez vexwum. Gewriya min zuha dibe û bîna min dimîne.

PÎR EMÎN

Çi yekî çil e !

ŞÊX HACÎ

Ser xwe ra, min ra dibêjî ?

*Casim gazî Xezalê dike :*

CASIM BEG

Xezal, Xezal !

*Xezal tê, Casim ser hêrs dikeve.*

XEZAL

Çi ye ? Çi te bihîstiye, hêrsa xwe te dîsa anî bîra xwe ?

CASIM BEG

Tu çi dikî ? Qe serê xwe nîşanî me nakî. Axir,

mêvanê me ji riya dûr hatine, westiyane, kesirîne, birçî bûne. Zû bike, şîvê bîne.

ŞÊX HACÎ

Xûşka Xezal, kerema xwe çeqilmastê min ra bîne, şêxê te vexwe, dua li te bike.

PÎR EMÎN

Casim Beg, nexeyide, tu car-caran mîna ewrê Nîsanê radibî, ser Xezalê hêrsa xwe radikî, ne baş e.

CASIM BEG

Lo, cisnê wê ne tu cisn e ! Ew jina malan e ? Zû şîvê bîne !

*Casim Beg çavê xwe li Xezalê cinû dike.*

XEZAL

Hû .... û, kevirî qulîb e, çima çavê xwe li min cinû dikî ? Te çi bihîstiye ?

CASIM BEG

Tuê zimanê xwe bibirî yan na ? !

ŞÊX HACÎ

Xezal, xûşkê, kurê xelerûtikê ka hîşt nan ber me da here ? Em têr çûn, birçî hatin.

*Xezal diçe.*

PÎR EMÎN

Cahilek bêfehmî kir, Şêxê têke çîrok. Te cahiltî qe xwe ne dîtiye ? Hespê xwe suwar bûyî, pey wana ketî. Axir, ew kurê mirîdê me ne. Bêje malê, hezar mal ji te çê be ! Mirîd, xêra dê-bavê xwe didin me, neheq in ? Semere pez derê te ye, ne ew malê mirîdan e. Tu merivekî bêşêkir î. Xwedê wê dîwana te bike.

ZABITÊ ROMÊ

Nebî, tu ketî derdê xwe ?

ŞÊX HACÎ

Ew ketiye derdê xwe, lê xwe ne ketiye derdê te û min.

PÎR EMÎN

Belê, ez ketime derdê xwe û miletê xwe.

ZABITÊ ROMÊ

Tu dawa çi dikî ?

PÎR EMÎN

Tu zabitê Romê yî, qewata we me da diçe. Çi dixwazin, hûn serê me dikin. Xwedê qebûl dike ? Çiqas sal e, bi destê zorê cahilê me dibin eskeriyê, hilbet seba çi ? Xewa kê tê ser sala sor ?

CASIM BEG

Tu ha bêje ! Derd-kulê xwe birêje, berga çi wê bigire ?

## PÎR EMÎN

Xwedê rastiyê hiz kiriye. Roma reş nahêlin cahilêd me pakî çavê xwe vekin. Nahêlin dê-bav ewled û tewledê xwe şa bin. Tune ew gund, tune ew mal, wekî bê derd be. Xwe, tiştekî derew-dizîka va nîne. Va ber çavan e, da ! Insan heye, insan ! Seba çi hinek milet gerekê bên vêsandin ? Seba çi milet bibe qûlê milet ? Ka rastî ?

"Lê, wê bê roja mawilheq,

li dunê wê bibe teqe-teq,

rû erdê wê tune bin padişê neheq !".

## ZABITÊ ROMÊ

Pîr ! Miletê we timê serê xwe rakirine, lê dîsa qûlê me ne. Pak bizanibe :

"Nîşanê dunê erd û ezman e,

bifikirî roj û şevan e,

sal heye sêsid şêst şeş rojan e,

destê padişê me ser Kurdistan e".

Ciyê xwe da ker be ! Bes e bike çele-çel.

PÎR EMÎN

Ez nakim çele-çel. Rastî çavê meriya qul dike.

ZABITÊ ROMÊ

Lo, pîrê bêaqil ! Tu xwe zêdetir xeber didî.

PÎR EMÎN

Eh, qewata sist ber ya zor mehrûm e. Lê, wê bên rojêd kefal, keda şîrîn wê bibe xumal. Neheqê hunda bin, we xweş şên be rengê dunê.

CASIM BEG

Lo, top mala we keve ! Zimanê xwe kurtkin, ya na, wê rojekê bibe bela serê we.

PÎR EMÎN

Mirîdê Casim, xûn nabe av. Milet şîrîn e, nabe kevir, çoka meriv nakeve. Xezal textê nan hazir dike.

CASIM BEG

Xezal ! Evda Xwedê, ne şêxê me çeqilmast xwest.

XEZAL

Sebirke ! Xwe deh dest, deh ling min va nîne.

*Xezal bi leze-lez diçe, şelbika çeqilmast tîne, dide Şêx. Şêx vedixwe, dua dike :*

ŞÊX HACÎ

Ocaxa min duaçiyê seheta te be, xûşka Xezal ! Çeqilmast çiqas xweş bû, ewê penca dilê min danî.

*Xezal şelbik hil dide, diçe.*

CASIM BEG

Keremkin, şîvê bikin. Hûn ser çava ra hatine.

*Piştî şîvê, Zabitê Romê û Casim Beg cixarê dikişînin. Pîr û Şêx tizmiya dikişînin.*

ŞÊX HACÎ

Ew derengî bûn !

CASIM BEG

De, ancax. Kengê tên, bira bên. Emê şevbiheriya xwe bikin.

ZABITÊ ROMÊ

Şên be û qedîm be ! Me şîva xwe têr xwar.

CASIM BEG

Ka, we çi xwar ? Bibexşînin, ev ne şîva we bû.

ZABITÊ ROMÊ

Serê me zêde ye ! Em zehf razî ne hurmeta we.

CASIM BEG

Xezal ! Xezal !

*Xezal tê odê.*

ŞÊX HACÎ

Xûşka Xezal, textê ber me hilde, me kêm kir, bira Xwedê zêdeke.

*Xezal textê nan ji ber wan dibe.*

ZABITÊ ROMÊ

Me usa xwar, gunê kafira me hat.

ŞÊX HACÎ

Kirin çi, ne hatin ?

CASIM BEG

Tu ber xwe nekeve, wê bên.

*Xeber di devê Casim da, Miko, Etar, Xişman, Xelîl, Reşo û çend dê-bavê cahilêd gund ji derva tên.*

RESO Û XELÎL

Êvara we xêr !

PÎR EMÎN Û CASIM BEG

Ser çava ra hatine.

ZABITÊ ROMÊ

Pêş da werin !

CASIM BEG

Ka, nav we da Wetê û kurê wê kivş nake ? Dibek me ber tiştekî hesab nake ? Bira ser wî guhî ranezê !

ETAR

Pozika sola xwe ra bêje. Em zû da ketine bin qamçî û nîrê giran.

XIŞMAN

Bira sebeb xêrê nebîne, ser çi eşqê Wetê û kur

bihata ? Nanê daweta wî erdê xistin û zirar dan, xwe usa nîne ! Insan gerekî fehmke.

ETAR

We seva çi gazî me kiriye ? Giliyê xwe bêjin, emê herin bêjin wana.

ŞÊX HACÎ

Tûle, te pê xwe hê ne avîtiye şêmîkê, ber mezina xeber didî. Miqatî zimanê xwe be, ya na, emê çepilê te bigirin û pişt derî xin.

ETAR

Dibêjin : "- Koro, çi dixwazî ? - Her du çava !". Lê, ya ez zanim, ez ketime devê gura, ezê kuda bifitilim ?

PÎR EMÎN

Gayê reş çermê xwe naguhêze. Em haj xeysetê wîna hene. Perda ruyê wî tune.

RESO

Etar cahil e, lê rast xeber da. Memê takî tenê ye, gerek bikevin halê wî, çimkî teze zewiciye.

XELÎL

Çi qewimî bû, vê şeva dereng we şandiye pey me ? Sibe tê, xêr pê ra !

REŞO

Hûn giliyê xwe bêjin û me bidin wextkirinê.

CASIM BEG

Erê, Reşoyê min ! A, va Zabitê dewletê, wê we ra xeberde. Ewî kire ser min wekî gazî we bikim.

ZABITÊ ROMÊ

Gelî Kurdê qafseqet, heye emirnivîsa dewletê wekî cahila bivin eskeriyê. A, eva jî emirnivîsa padişê, bi mor û nîşan.

*Zabitê Romê emirnivîsarê pê herdu desta hil dide û nîşanî gişka dike.*

CASIM BEG

Dibînin ? Paşê, loma min nekin !

REŞO Û XELÎL

Em dibînin, xwe ne kor in.

CASIM BEG

De, çaxê ne kor in, bela bin û berbangê bêdera Şêx Haciyê da topî ser hev bin. Wê derê, ezê cahila teslîmî Romê kim. Lê, Memê gerekî pêşiya gişka hazir be. Weyl wan, kê xwe veşart !

ŞÊX HACÎ

Hûn ber xwe nekevin : Hûn gerekê kumê xwe ber bi ezmana bavêjin, wekî dewleta Romê dixwaze cahilê we bîne rêza merya.

ETAR

Dengê defê dûr va xweş e ! Hilketin, daketina dunê heye. Şêx ! Sebirke, wê roja we jî bê.

ŞÊX HACÎ

Dilê we da çi dişêwire, Xwedê ya we neke.

REŞO

Hîviya min heye, seba Memê qelpê xwe xirav nekin, wî sitarkin. Ciyê qencî lê, xirabî çi ye ?

ZABITÊ ROMÊ

Badilhewa, lavaya nekin. Herin, karê cahilê xwe bikin.

*Xelîl hêdîka ber xwe da nifira dike :*

XELÎL

Serê te jêbûyî, Zabito ! Mala te here mîrata ....

XIŞMAN

Em ber we lava dikin, çawa ne ? Qe rehma dilê we tune ? Em teweqe dikin, dest ji Memê bikişînin.

ZABITÊ ROMÊ

Bicehimin herin ! Ez dengê we îda nebihêm.

REŞO

Wekî hûn dil bikin, hûnê kurê Wetê, yekî tenê, bihêlin.

CASIM BEG

Reşo ! Tu çawa gedê duh na, pêr xeber didî ? Te bihîst çi gote we ?

REŞO

Belê, min bihîst.

ŞÊX HACÎ

Tu nexeyide. Memê xwe ji Xwedê da ne hatiye. Dibe

ku van cahila çêtir e ? Yanê, Memê kurê dê ye, yê din kurê dêmariyan in ?

XELÎL

Şêx ! Tu bûyî eduyê (dijmin) me, bira Xwedê dîwana te bike.

*Reşo destê xwe dide ber devê Xişman :*

REŞO

Ne sûcê we ye. Hûn jî zanin ro ji kî alî dertê. Meseleke kurt bêjim : "Erebe bi tije balte ber bi mêşe diçe. Zûkîn dikeve nav mêşe. Dara pîr ji dara pirsî : "Ev çi zûke- zûk e ?". Dara rom : "Erebe bi tije balte ber bi me tê, wê koka me biqelîne". Dara pîr go : "Çaxê ku erebe nêzîk bû, binhêrin cinsê me nav da ne ya na". Erebe nêzîk bû. Nihêrîn cinsê wana ne nav da ne û çûn romin dara pîr. Dara pîr got : "Wekî cisnê me ne nav da ne, netirsin. Min wee ra qise kir, çawa dixwazin usa jî ferhmkin. Lê aqilê xwe bicivînin ser hev".

ETAR

Lo, kes tune serê me bipelêxe. Seva çi ked û qazanca me bive risqê we û hûn emrê me ra dilîzin ?

XIŞMAN

Hê kanê, bêaqiliya me ? Lingê me kevira bikeve !

XELÎL

Rehmetiyê kalikê min digot : "Em pîr in, bû sur in !".

CASIM BEG

Çîroka min ra nebêjin !

REŞO

Rind zanibin ! Sal heye donzdeh meh rûkarê vê dunyayê. Ev êvara han ji dilê me dernayê.

ZABITÊ ROMÊ

Ji dilê we derneyê, hûnê çi bikin ?

*Casim Beg hêrs dikeve :*

CASIM BEG

Hela min li wan dinihêrin ? ! Min nedin leqandinê, ya na, ezê we bêhurmetkim.

ZABITÊ ROMÊ

Pira ber hindika danaxin. Ev mesela we ye. Bêjin, nebêjin, serê we da rûnanê.

REŞO

Giliyê me bal we derbaz nabe. Kê çavê kesîba dinihêre ? Xwarina we birinc e, ya me savar.

ETAR

Em çi sekinîne, stuyê xwe ber wana xwar dikin ? Em derkevin, herin. Dibêjin :

"Hosta necar,

Razê weke hercar,

Xwedê yek e, derge hezar !".

*Etar dide pêşiyê, yên din didin dû wîna, diçin.*

PERDE

# QEWIMANDINA SISIYAN

*Mala Wetê. Berbang e. Memê li ser kursî rûniştiye, serê xwe berjêr kiriye û ketiye mitala. Eyşê li kêleka Memê sekiniye û pirçû kiriye. Wetê qerefîska devê tûrikê yê riya Memê pê ben girê dide.*

WETÊ

Sebebkar xêrê nebîne, lawo ! Wana çawa derê min dadan, te kirin tehlikê. Xelîl, Reşo, Xişman û Etar çûn mala Casim Begê, bal Zabitê Romê, lava kirin, wekî te nebin eskeriyê. Lê berî wan dan û gotibû : "Berbangê, gişk cahil hazir bin !". Cegera wan qulb e ! Mala wan ber tofanê here. Çawa nahêlin kurê min rojdehnekê mirazê xwe şa be ? Qe kê ecêba wan dîtiye ?

MEMÊ

Inê, çima tu ber xwe dikevî ? Eniya kurê te çi nivîsiye, wî jî wê bibîne. Her min çetin tê, şaya min da gotî biqewimiya. Tune bû rojê din ?

WETÊ

Bextê te ketiye bin kevir da, kurê min ! Lê, çima

dibêjin : "Bira bextê meriya hebe, çavekî meriya tune be !".

MEMÊ

Ez ne ketime derdê serê xwe, ez ketime derdê we.

WETÊ

Êh, kurê min, mala bê mêr xirabe ye. Lê ez mêra-mêr im, jina-jin im ! Diya te heta sax e, heta qudûm ber çokê min da heye, nahêlim çilke leke bê ser dawa jina te. Ezê çavê xwe ra xweykim, nahêlim ji siyê here ber tavê.

MEMÊ

Me bi dil hev standiye. Bûka te ne ji mala xirab e. Eslê çê ye ! Qebîla wan bona namûsê serê xwe didin.

WETÊ

Rast e. Dibêjin : "Ji dê-bava dikevin hezar ewled". Lê, ya ez zanim, bûka min hêja ye, ji dê û bavê xwe kêmtir nîne.

MEMÊ

Lê ez çi dibêjim ? Wekî ew qîza wan dê-bavan e, qe te minet tune. Ew qeder, qedrê te bizanibe.

*Memê radibe tevîzek dide xwe. Kela giriyê dide ser Eyşê, xwe zevt nake, bi xwesiyê ra xeber dide :*

EYŞÊ

Inkê, ruyê min bin pê te da ye, wekî ez ber te xeber didim. Dê were roja wa, dilekî bîne, zarekê bîne kerr be.

*Wetê serê xwe bilind dike, li Eyşê dinêre :*

WETÊ

Tu xweliyê li serê min kî, îro xwe ne roja bûktiyê ye. Kê ev adet anî dunê, bira li wê dunê ciyê wan cehenemê be ! Îzn e, qîza min ! Nav bi namûs be, tiliyê xwe bike çavê min. Kî min heye ? Ser şirîkê me kê ne ? Ez û tu ne. Mal mala te ye. Destê xwe be, bista xwe be ! Bû ya min, tu wê dibînî : Tevir, bêrek min maye. Emrê min pir çûye, yê hindik maye.

*Wetê radibe, tûrikê riya Memê hil dide, datîne qulç û ser kursiyê çîm rûdinê, lingê xwe miz dide.*

EYŞÊ

Inkê, çima ez nizanim xelqê çi bêje ? Min xwe nan guha nexwariye. Wê bêjin : Pê-parê bûkê ne pê-parê xêrê bû. Inkê, guhê te ser min e ?

WETÊ

Erê, qîza min, guhê min ser te ye. Wan giliya ne hilde, ne dayne. Kê çi dibêje bira bêje. Kes xweyê serê me nîne. Dibêjin : "Bira Xwedê yar be, evd neyar be". Tu şerm neke, xeberde, bûktiyê neke. Ez jî dewsa diya te me.

EYŞÊ

Inkê, usa zanibe, wekî ez jî te ra kur im. Ezê xêliya xwe bavêjim, pişt bidim xwesiya xwe, hela Xwedê çi dike.

WETÊ

Qîza min, ez ne xwesîke xirab im. Heta ez ser se-het-qeweta xwe me, nahêlim tu belengaz bî.

EYŞÊ

Çima emrê min emrê kurê te çêtir e ?

MEMÊ

Hewa çiqas sar be, ba û bager be, mij û dûman be, merî gotî gumana xwe nebire, ji roja tav, roja şayî.

EYŞÊ

Bira Xwedê hewara te va bê. Çi dikarin bêjin ? Helbet Xwedê usa me ra xwastiye. Duşirmîş nebe. Kal û bavê me gotine : "Şîna tev hevala şayî ye".

WETÊ

Eferim, qîza min ! Şîrê te mêtiye, te helal be. Lê dilê dê ra qe çi dibêjî ? Axir, ceger şîrîn e ! Min kur ji av, agir xwey kir, mezin kir seva wan ? ! Nav çavê min dixin, kurê min ji min distînin, dibin. Belkî cegera wan jî qul e ! Birûsk qapiyê wan xe .. !

EYŞÊ

Sal tên, diçin, ev zulma hilnayê.

*Wetê radibe ser darê piya, herdu destên xwe bilind dike, nifiran dike :*

WETÊ

Xwedê ... ê, Xwedê ! Tu textê padişê welgerînî û şextê mala Casim Begê xî ! Berê da bûye eduyê min û kur ! Ne Xwedê, ne kula Helebê pê nikare.

*Wetê rûdinê û digirî. Memê di ber dil da tê.*

MEMÊ

Inê, ser oxira min negirî. Dibêjin :

"Hosta Necar,

Razê weke hercar,

Xwedê yek e, derge hezar".

WETÊ

Erê, ez qurban, îlaca diya xwe ! Wekî ez negirîm, lê kê wê bigirî ? Tu diçî xerîbistanê, destê min ji te diqete, gunê te qe min nayê, lawo ?

MEMÊ

Gunê min wekî we neyê, lê wê kê bê ? Hûn dilê min xirab dikin.

WETÊ

Qudûmê çoka diya xwe ! Xweyî xudanê min, lawo ! De tu rabe, agirê kulê beyta mala bavê min xe. Paşî te saxbûna min çira ye ?

*Xeber di devê Wetê da, Etar û Xişman torbê wan di milan da, ji derva tên.*

ETAR Û XIŞMAN

Siba vê malê xêr !

WETÊ Û MEMÊ

Ser çava ra hatine.

WETÊ

Sebebkar xêrê nebîne !

ETAR

Dayika Wetê, tu sebirke ! Wê bê ew roj, bi serkariya merivêd aqil, rojekê wê bibe xîret : Pale û gundî wê rabin, li dunê wê bibe teqe-teq, pêsîra me wê xilaz be ji destê padişê neheq.

XIŞMAN

Te dîsa dest wan vir-derewê xwe kir. Ewrê em dibînin baran lê nayê !

ETAR

Welleh, ew roj nêzîk e, ne dûr e. Dunya milkê tu kesî nîne. Wexta ecel bibe diyar, ew ser meriya dike ferwar, hizkî bike gazî : Hey hewar !

WETÊ

Ez heyrana te wî devî û wê gotinê ! Emrê min pir çû, yê hindik ma. Çiqas sal e, sal-salê xirabtir e. Dewrana ku tu dibêjî, heta bê emê ji dunê hunda bin.

MEMÊ

Ne sûcê we ye ! Rehmetiyê bavê min digot : "Kurê min, meriyê nexwandî tariyê da ne". Her neyse, hûn herdu tenê ne ?

XIŞMAN

Na, ew va tên.

ETAR

A, va wê dengê wana tê.

*Reşo, Xelîl, Hacê, Zadînê, Almast û cînar ji derva tên. Wetê radibe.*

XELÎL Û REŞO

Siba we xêr !

HACÊ, ALMAST Û ZADÎNE

Siba vê malê xêr !

RESO

Serê min qurbana serê we cahila be. A, usa terka hevdu nedin. Meriyê tenê, çawa teyrê bê per, bê bask.

ALMAST

Çavê min birijin bona Memê.

*Almast, Zadîne û Hacê diçin serê Memê.*

WETÊ

Bira çavê dijminê te birijin. Pêş da werin, ez qurbana we me ! Werin, qaskê rûnên, belkî penca dilê min datîne.

REŞO

Dereng e, em rêkevin.

XELÎL

Wekî em egle bin, Casim Beg wê me rezîl bike.

HACÊ

Lo, mêrik ! Tu çi yekî tirsonek î. Pêsîra min yekî çawa alya ! Casim kurê te dişîne, xwe nayê min jî, ji te nastîne, tu ditirsî.

REŞO

Casim qelet kiriye !

XELÎL

Jinik, tu çi dibêjî ? Mala me şewitiye, ocaxa me kor bûye, tu zanî ya na ?

HACÊ

Gava behsa Casim Begê dikin, ziravê dilê wî diqete û şalê wî dikeve nav linga. A yekî usa newêrek e. Qey tuê bêjî : "Casim Beg pişîk e, ew jî mişk e, ji lê ditirse". Qertelo ! Ew jî merîkî mîna te ye. Zehf jî beg e ! Laçika jina serê te be. Tu jî wê bêjî, ez bavê Etar im !

*Hacê pê her du desta, gijikekê li ber Xelîl dike.*

ETAR

Inê, te ji bavê min xêr e ? Tu bê hemdî xwe xeber didî.

ALMAST

Hacê ecêb e ! Mêr, mêr gotî; jin, jin gotî.

HACÊ

Êh ! Xayinga min dela, merî orta mêr, jin xeber nade.

ALMAST

Tu ecêb î ! Kê te dûr e, gul û nûr e.

*Bawîşk tê Reşo, serhev.*

REŞO

Bawîşkê çawa têne min. Xûşka Almast, welleh ocaxa cin teyar kim, bawer dikin wekî xew çavê min ne ketiye.

ALMAST

Ez te bawer dikim, birê Reşo. Lê, herama reş be, hergê çavê me jî çûne ser hev.

ZADÎNE

Ya Memê qe bîra me naçe, Xwedê jor şahde ye !

HACÊ

Zemanê em tê da, ne tu zeman e. Birîn birînê teze dike.

REŞO

Giliyê Şêx qe bîra min naçin. Yekî geveze ye ! Loma dibêjin : "Geveze tune bin, mî û gurê tev biçêrin". Çav li Zabitê Romê ketibû, wî tirê ew şahê Îranê ye !

HACÊ

Birê Reşo, dewran ne tu dewran e. Dewsa şêra, kund dikin sêra !

RESO

Derheq Memê da, me haqa lavayî kir, lê Casim qe ne dixwast bibhê. Ser me hêrs bû, me bêhurmet kir, û em derketin, hatin.

XELÎL

Welleh wisan bû ! Serê bavê xwe kim, wekî hûn bawer bikin, me û wana gelekî da ber hev, lê ne ketin halê Memê da. Na û na !

XIŞMAN

Bextê me bextekî usa ne, wekî em herin ber çem, çemê li me bimiçiqe.

ZADÎNE

Ji vir ha da, dost û dijminê xwe nas bikin.

XELÎL

Axir, Etar û Memê stirînê çavê Casim in. Hê zû da, ewî kîna her du cahilê me girtiye. Belkî razana wî hebe, rabûna wî tune be !

HACÊ

Av serê kaniyê da şêlû dibe. Begê me ketiye derdê serê xwe. Ew ne ketiye derdê cimaeta xwe. Heta ew beg e, emê vê rojê da bin.

ZADÎNE

Wekî bextê kesîba hebiya, cotê wan li çolê ne dima.

REŞO

Bira merî mêr be, kelemê çavê neyara be.

XELÎL

Xwedê rehm e ! Dibêjin : "Darbiro, dara bibir, destê xwe eteka Xwedê ne bir". Hûn diçin, kevir ber pê we bibe penîr.

HACÊ

Tengasî û fireyî hevalê hev in. Bira Xwedê we ya xirav xwayîke. Xêr herin, silamet vegerin.

WETÊ

Erê ... erê ! Her yek ji we xwe ra gilîkî dibêje. Ya hatiye serê min, ne hatiye serê tu evd-însanî. Derdê min bira nede gurê serê çiya. Gur jî gune ne.

HACÎ

Tu ber xwe nekeve, dinya bi sebrê ava ye. Miqatî xwe be. Bira eduyê me kunî-kunî be.

WETÊ

Eyşê, lawo ... Qudûm nakim rabim. Kulavê, kursiya bîne, bira deqekê rûnên. Ka, hiş-sewda serê min da maye ? Gêj bûme, çûme !

*Eyşê dike here kulav, kursiya bîne. Reşo nahêle :*

REŞO

Kesek ji me rûnanê. Em gotî herin, wekî ser me nekin ewte-ewt. Memê, tu hazir î ?

MEMÊ

Ez hazir im.

HACÊ

Birê Reşo, çend deqa jî xwe egleke, paşê herin.

*Reşo dengê xwe nake, cixarê dikişîne.*

XIŞMAN

Şêx rex Zabitê Romê rûniştibû û xeyba gundiya dikir.

ALMAST

Behsa wî nekin, ew yekî durû ye.

ZADÎNE

Ber çavê gişka xwe daye reş kirin. Ez dibêjim : Marê reş ber çavê min keve, ne ku ew !

XELÎL

Hûn xwe egle dikin. Casim wê çêrî we bike

ETAR

Kivş e, sawa wî ketiye ser we. Hûn jê ditirsin.

XELÎL

Serhişkayiyê neke, kurê min !

ETAR

Xwedê qebûl neke, seba çi emrê me çiremîş be ber dewleta Romê da ?

REŞO

Çavê geleka ji we dirije. Hûn dost û dijminê xwe ji hev dernaxin. Aqil bin, kulmê neçin dirêşê.

WETÊ

Reşo rast dibêje ! Aqil bin ! "Aqil tacê zêrîn e, serê hemû kesî da nîne".

HACÊ

Ax ... Ax ... ! Miletê kurd her tenê maye li dunê bê serî. Tirk çi bêjî serê me dikin.

ZADÎNE

Zeda darê ne ji darê be, zewala darê tune.

WETÊ

Felekê çerxa me çep bada. Cahilê me dibin serheda dûr, bira miqatî hev bin, yan na Tirk xayin e. Bira Xwedê oxir, namûsê bide we.

XIŞMAN

Em derengî bûn, beg û zabit wê ser me hêrsa xwe rakin.

ETAR

Sebira te nayê, çi lez dikevî ? Tu çi yekî tirsonek î ! Loma dibêjin : "Nav heye, hereket tune ye !".

XELÎL

Kuro, wextê heneka nîne ! Seh ber derê xwediyê xwe dirê.

*Xeber di devê Xelîl da, Casim Beg û du qewazava ji derva tên. Eyşê xwe davêje pêsîra Memê, kûrîn dikeve Wetê. Casim hêrs dikeve, çav lê fireh dibin, ser gişka dike qare-qar.*

CASIM BEG

Gelî seyê seh, ne axir em hîviya wan in. Zû, rêkevin !

*Casim Beg çavê xwe li Etar û Xişman cinû dike. Etar û Xişman kerre-kerr torbê xwe hil didin, der-dikevin der.*

*Casim Beg vedigere ser Memê. Wetê xwe davêje pêsîra Memê. Casim dest davêje çepilê Wetê û Eyşê, wan dide alîkî. Milê Memê digire, dev dide, pişt derî dixe.*

RESO

Casim Beg, tu ji riya Xwedê ketî ! Qewata xwe cahila da dicêribînî ?

*Casim Reşo dehv dide, dertê û diçe. Wetê digirî.*

WETÊ

Birûsk mala te keve, Casimo ! Mala te ber tofanê here ! Axir, ez im û ew kur. Wî jî dişînî ser sêla sor. Ne, ez guhne me.

HACÊ

Xwedê usa me ra xwastiye. Ka xayî-xudanê me ? Berê Kurd bûn xwedanê tac, serdest, xurt bûn, serbest. Îro, em mane bindest. Belkî padişê Roma reş xêrê nebîne, devê xwe kiriye cegera me, xûna me dimije.

XELÎL

Hûn çiqas bêjin, nebêjin, derdê dunê para me ketiye. Xwedê wê çarekê bike. Zû bikin, xwe bigihînin wan.

*Reşo, Xelîl, Almast, Zadîne, Eyşê û Wetê ji malê dertên, diçin.*

PERDE

# QEWIMANDINA ÇARAN

*Mala Wetê. Wetê teşiyê dirêse, lê Eyşê sirsûmê dew dikile.*

WETÊ

Lawo, gelo halê te bû çi ? Xazil, xêra mala Xwedê ra cewab bihata, bigotana : "Kurê te filan derê ye, sax û silamet e ...". Ev behs biketa guhê min da, dunya alem da tiştek ne dixwast. Minê tûrikê parsê bavîta milê xwe, pars bikira, nanê germ derxista, nav kesîb-kûsîba bela kira; wekî biviya fireyî, bihata pêşiya Memê min.

*Wetê digirî. Kela giriyê dide qiriqa Eyşê.*

EYŞÊ

Çaxê tu digirî, dilê min xirab dibe. Bes e, dest vê girînê belengaz bûyî. Sehet û qewat timê dest meriya nakeve. Guh bide ser xwe.

WETÊ

Seba ku ez negirîm, lê kê wê bigirî ? Duh na pêr, hevt salê wî xitim bûn. Ez porkura-porkur nizanim

kurê min kê derê ye, li kî da ye. Çi bikim ? Kuda herim ? Hevt sal e, çawa ketim dû salix-sûlixa, nikarim pê bihesim. Ewî stuyê min xwar kiriye, qe zanî ?

EYŞÊ

Inê, lê min qe te ra gilî ne kir. Îşev min xewn dî.

WETÊ

Xwedê xêrke, qîza min.

EYŞÊ

Ew qewalê hatibû mala Şêx Hacî, tê bîra te ?

WETÊ

Çawa nayê bîra min ! Eva muxdarê seh. Çar mehan e, çawa ew qewal çûye.

EYŞÊ

A, xût ew qewal hat xewna min.

WETÊ

Qîza min, kê derdê kê dikişîne ? Em ji bîra wî çûne.

EYŞÊ

Ez bawer nakim, wekî ew me ji bîra xwe bavêje. Bivê nevê, ewê salix hilde. Û zû be, dereng be, wê cewabekê ser me da bişîne. De, tuê xewna min bicêribînî !

WETÊ

Bextê me ne hevalê bextê hinekan e. Tu xewna xwe şiroveke.

*Eyşê sirsûmê dew dide sekinandin, xewna xwe şirove dike.*

EYŞÊ

Guhê te ser min e ?

WETÊ

Erê, qîza min !

EYŞÊ

Xanîkî fireh da rûniştibûyî, û kincê xas wergirtibû te. Şara gevez te dabû serê xwe û cote bazinê zîv-avzêrkirî zenda te da bûn. Ez mîna vê dinê dibêjim te : "Peh, bi çi dilî, mîna bûka hivdeh salî xwe xemilandiye ? Dibe ku te qelbê xwe xirab kiriye ?". Tu ser min hêrs ketî. Nişkêva, yekî nenas derî vekir, ser dengê me da hat û go : "Ya ... ya ... We ji hevdu xêr de ? Mizgîna min we ra, xerîbê we van roja mêvanê we ye". Gava ewî usa got, şabûna lingê min erd ne girt. Lê, te çi kir ? Tu ji ciyê xwe rabûy, wê lezê çûy goma pêz, kavira qer veqetand, anî da wînî. Û te got : "Eva, mizgîna te !".

Ev yek min xweş ne hat. Min got : "Na ... û na ! Kavirê ber bexçа min ketiye, yeke din bidê. Ez dest davêjim kavirê, ser xwe da kaş dikim, lê ew mêrik ser xwe da kaş dike. Te dehf da min, ez ser piştê ketim. Hişyar bûm. Eva xewn.

WETÊ

Xewna şevan e, lê xewneke ne baş e.

EYŞÊ

Inê, tu naçî mala Hacê ? Parzûnê me peritiye, yê wan teze ye.

WETÊ

Baş e, te kire bîra min. Şixulê min cem heye.

*Wetê teşiya xwe datîne, dixwaze here.*

EYŞÊ

Zû were, egle nebe.

WETÊ

Na, lawo ! Ezê zû bêm.

*Wetê diçe. Eyşê sirûmê dew dikile. Derva, dengê Şema parsekçî dibihê.*

ŞEMÊ

Wetê ... Wetê ! Tu mal da nî ?

*Şemê şivik di dest da, kincê gincirî lê, torbê parsê mil da, tê nav malê disekine.*

EYŞÊ

Çi dixwazî pîrika Şemê ? Wetê ne mal da ne.

ŞEMÊ

Qîza delal, roja vê malê xêr ! Halê parsekçiya halekî rezîl e. Îro, haqa germiyame, ling mi va ne mane. Bûme goştê kifta.

EYŞÊ

Ser çava ra hatî. Derê torbê xwe veke, ez te ra nan û toraqê dagirim.

ŞEMÊ

Erê, qîza min ! Kivş e, tu yeke dilovan î, qedirgir î.

*Eyşê hûrikê nan, toraqê valayî torbê Şemê dike.*

ŞEMÊ

Min gazî şems kiriye. Evdê, tu tucar tehlî-tengasiyê nebînî. Bira bive teseqida riya dûr. Bira Xwedê ber destê we kêm neke.

*Şemê derê torbê xwe girê dide.*

EYŞÊ

Pîrika Şemê, xwesiya min wê dereng bê, hîviyê nesekine.

ŞEMÊ

Ezê herim, lê dixwazim hinekî hêsa bim.

*Eyşê kursiyê çîm tîne, Şemê rûdinê.*

ŞEMÊ

Evdê, Xwedê emrê dirêj bide te ! Ez haqa nikarim ser darê piya bisekinim. Ka, qewat çok da mane ? Pîr bûme, ya xwe ketime. Tu min û xwe dikî yek ? Şikir, tu cahil î, beng-benga te ye !

EYŞÊ

Zanim, wekî kalbûn-pîrbûn emrê çetin e. Le, çima dibêjin : "Mirin hebûya, kalbûn-pîrbûn tunebûya" ?

ŞEMÊ

Erê, erê ... Qîza min. Tu rast dibêjî. Lê, temiya min li te, roja xweş nede roja reş. Kê zanê, sibê wê çi biqewime. Qe namê mêrê te tên ?

EYŞÊ

Nama çi ? Eva hevt sal e, ne namek e, ne cewabek e, ne xeberek e.

ŞEMÊ

Çavê min birijin ser mêra, ser şêra ! Ji serheda dûr, tek-tûka vedigerin. Bira Xwedê hewara wan û mêrê te bê.

EYŞÊ

Xwedê îmanê bide te. Pê bî, gorê bî !

ŞEMÊ

Tesediqa riya dûr, şelbika dewê dewkilê nadî min ? Temê min dikişînê.

EYŞÊ

Vê lehzê ! Ez ne yeke usa nim, wekî çavê te tê da bihêlim.

*Eyşê şelbik tije dike, dide Şemê. Şemê vedixwe.*

ŞEMÊ

Peh ... he, çiqa xweş bû ! Tîbûna min şikest. Dua Xwedê risqê we be ! Hestuyê min rehet bûn.

EYŞÊ

Loşî canê te be. Dixwazî dîsa ?

ŞEMÊ

Na ! Na, berxa pîrika xwe. Ez zehf razî me ! Eva hevt salê mêrê te ye, çawa birin eskeriyê, qe gilîkî

xirab ne hatiye ser pêşa te. Şîrê te mêtiye, li te helal be.

EYŞÊ

Pîrika Şemê, bira hefsa meriv bike ji qurubuxdanê insanê vê dewrê.

ŞEMÊ

Kivş e, tu qîza esilzada yî. Buxdan pêşê merivê ne pak in. Ser bextê mi da be, şivêta bûkê nolî tune ne.

Gund tev da serê te sond dixwe. Çend bûk hene, naxwazin navê wan hildim. Wana xwe kirine sosret. Ne gora xwesiya dikin, ne gora tîteriza. Dawa xwe avîtine ser dêla xwe.

EYŞÊ

Kê qedirê mezina nizane, ew bêar-bêabûr in.

ŞEMÊ

Erê, qîza min. Nav-namûsê te li te helal be. Yekî

nolî Casim Begê ser te dimire. Bê jin e. Jina wî par qurbana me bû. Paşê wê yekê, zehlê min biriye. Lingê min kiriye sola teng da.

EYŞÊ

Seba çi zehlê te biriye ?

ŞEMÊ

Ezê bêjim, lê gilî orta me da bimîne.

EYŞÊ

Pozika solê xwe ra bêje. Gilî germandin ne pêşê min e. Bêje, guhê min ser te ye.

ŞEMÊ

Casim Beg dawa zewacê dike. Eva giliya orta me da bimîne. Behsa te dike. Ez, ya bê bela tînim serê wîna, dibêjim : "Kalê xerifî, şerm nakî, behsa bûka Wetê dikî. Erdê sar da herî xwarê". Lê, ser bextê min da be, camêrekî zehf baş e, dewletî ye. Kê bikeve wê malê, hebûnka Casim ya wê ye.

*Eyşê hêrs dikeve :*

EYŞÊ

Tu haj qafê serê xwe heyî, çi xeber didî, keftar ? !

ŞEMÊ

Bibexişîne ! Ez gunê xwe bidim ruyê xwe, min gotê : "Ezê herim, nek naçim, lê dûrî aqilan e".

*Çav li Eyşê fireh dibin, hêrs dikeve :*

EYŞÊ

Ewê kopek tu şandî cem min ? Ezê rêxa vî gundî rokim ser tirba Miriyê wî, kîjan ber dilê wî da şîrîn e. Keftar, le te çi da hişê xwe, hatî ?

ŞEMÊ

Çi te veşêrim ? ...

*Eyşê gilî di dev da digire û li ser wê dike qarîn :*

EYŞÊ

Zû ... û, zû bicehime here, ber çavê min nesekine ! Xwesiya min vir buya û te usa xeberda. Wê rêxa tewlê da çiqa heye, wê hilda û rokira ser şilika wî, hîlê zikê wî kel bida, ya te jî pê ra !

ŞEMÊ

Min guyê zeremêşê xwar ! Gilîk bû ji devê min derket.

EYŞÊ

Zû bike ji vira here, hê xwesiya min ne hatiye.

*Mirûzkirî, bi tehl û tirş, şivika xwe hil dide, torbê xwe davê milê xwe û dike birme-birm.*

ŞEMÊ

Min nizanîbû wekî tu yeke berzeq î ! Min bi dilê sax te ra got.

EYŞÊ

Ne min got : "Bicehime here !". Wî dilê xwe yê sax, a bike torbê xwe, xwe ra bive, keftar !

*Şemê dertê, diçe. Wetê tê malê.*

WETÊ

Eyşê lawo, te Şema parsekçî xwe bê qedir verê ne kir ? Derê malê rastî min hat, qe xwe min ne kir xwayî. Birme-birma wê bû, hewraz çû.

EYŞÊ

Min jê ra sond xwariye. Ew careke din berê xwe bide vê şêmîkê, ezê herdu lingê wê bişkênim.

WETÊ

Seba çi ? Dibe ku ewê lingê xwe, guhê xwe xistiye ? Xeyîsetê wê xirab e, carna bê hemdê xwe xeber dide.

EYŞÊ

Ewê çi got, bira kîsikê wê da bimîne.

WETÊ

Hebe-tunebe, tiştek gotiye te, tu ji min vedişêrî.

EYŞÊ

Na ! Ez venaşêrim.

WETÊ

Lê, çima hêrsa te li ser rabûye. Dibe ku ketiye kirê te da ?

EYŞÊ

Qelet kiriye ! Tu çawa ji malê çûyî, pey te ra ew hat. Min hûr-mûrê nan, toraq kire torbê wê. Nav malê sekiniye, naçe. Go : "Dixwazim hinekî hêsa bim". Min dilê xwe da go : "Serê te bixwe !". Kursî jê ra anî, ew rûnişt û kire çele-çel. Qerez, mejiyê serê min kire dew.

WETÊ

Ê, paşê ?

EYŞÊ

Paşê, dew xwest. Min dew da wê. Lê, rûniştiye û naçe. Ez ser va çûm, wekî mîza wê ne zelal e. Gilî ber min ra avîtin : "Zanî, yekî mîna Casim Begê ser nav-namûsê te dimire. Eva muxdarê çend rojane, gazî min kiriye û behsa te kiriye. De par va, çawa jina wî miriye, lingê min kiriye soleke teng". Ez pêra-pêra ser va çûm, çi dilê wî da dişêwire.

Inka xwe ra bêjim, ewê çawa usa got, de bextê te da me, çi hate ber devê min, min gote wê. Reve-rev çû ! A, eva jî ya min û Şemê.

WETÊ

Bextê wê lêxist ez pê ra ne gihîştim. Ew kopekê, kurê kopeka wê şîret dike û vir da dişîne. Serê mêra kiriye ! Bira ew, mîna seh, ser dêla xwe bikeve. Vê jinaniya min jî mabe, ezê serê wî, mîna termaşê-xwe, têkim dû kera. Ez Wetê me ! Ji mêra mêr im, ji jina jin im ! ....

EYŞÊ

Naka dibêjin : "Wetê pîr e, bûka wê cahil e, belkî ji rê derdixin". Lê nizanin wekî Eyşê benûştê meriya eniya meriya da dizeliqîne !

WETÊ

Ewan hînî bûkê hineka hatine, û wan tirê gişk yek in. Lê, nizanin jin jî hene, jinikok jî hene !

EYŞÊ

Wê rêxê berevkin, çi bikin ? Karê te li wana ne ketiye. Min usa jî xewneke xirab dîtiye.

WETÊ

Ez qurbana bûka xwe me, xwe naçim şerê wana. Herkê rastî vê nevsê hatin, du giliyê min hene, ez bêjim wana. Ez diya te me, tu bisekine !

*Wetê rûdinê, teşiya xwe dirêse. Berî êvarê ye. Reşo û Xelîl ji derva tên.*

RESO Û XELÎL

Êvara vê malê xêr !

WETÊ

Ser çava ra hatine. Keremkin, pêş da werin, rûnên.

*Reşo û Xelîl rûdinên.*

REŞO

Eva sê rojê min û Xelîl e, em ne hatine. Lê, ez ya bêjim, qe serhêsay nabim.

WETÊ

Bextê min da be, hûn cînarne xêrxwaz in, hertim halê me dipirsin. Bira Xwedê jî halê we bipirse. Her tenê, seba Memê min, kurê min, kurê me, sibê heta êvarê girî û hêsir in.

XELÎL

Xûşka Wetê, min pezê we kirin gomê, lê miya qer qe ne çêriya. Guhê we ser be.

WETÊ

Bira mî qurbana we be ! Ketî derdê miyê ? Qeda-bela heye, bira bê serê miyê !

REŞO

Derda xwe ra pir nekin. Xem jî xirab in. Dixwazim bêjim : "Tune dar, wekî ba lê ne xistiye".

XELÎL

Êh, ceger şîrîn e !

REŞO

Welleh, serê bavê xwe kim ! Gişka zehftir dilê min dişewite ser wan.

WETÊ

Ser bextê min da be, usan e ! Tu me zehftir ser wan dişewitî.

REŞO

Cara giliyê Memê dikevin bîra min. Wî digot : "Roj

çiqa ewrayî be, mij û dûman be, merî gotî gûmana xwe nebire ji roja tav, ji roja sayî".

WETÊ

Diya wan pepûk be ! Eva hevt salê wan e, çawa ji mala xwe qetiyane. Dûrî wan be, serêşî heye, diraêşî heye, çi bêjî heye. Ka, qe kê ji me haj pê hene ?

XELÎL

Bira sax-selamet bin. Kal-bavê me gotiye : "Meriv bira ne goristana be, bira şaristana be". We hew nihêrî me va derketin.

WETÊ

Ka, Xwedê dengê te bibihê !

*Xelîl û Reşo dixwazin herin.*

WETÊ

Bidin xatirê navê Xwedê, rûnên, şîvê bikin, paşê herin.

RESO

Em zehf razî ne, emê herin.

XELÎL

Em diçin, guhê we ser miya qer be. Berbangê, ezê bêm, teselîkim. De şeva we bimîne xêr !

WETÊ

Herin ser xweşiyê.

*Reşo û Xelîl diçin.*

EYŞÊ

Inê, te parzûn anî ?

WETÊ

Peh ... he ! Min bîr kir. Ka, hiş û sewda serê min da maye ? Mîna mirîşka gêj hatiye.

EYŞÊ

Tişt nabe. Were alî min, em dew valayî sîtilê bikin, bivin kox.

*Nişkêva, dibe gure-gura ewran.*

WETÊ

Kambax be serê me da, dîsa ewra birq veda.

EYŞÊ

Kivş e, barana gur wê bê.

WETÊ

Evê baranê zele biriye.

*Wetê û Eyşê dew valayî sîtilê dikin, dibin kox.*

EYŞÊ

Ciya daynin ?

WETÊ

Erê, ciyê min ber tendûrê dayne.

*Eyşê ber keviya tendûrê nivîna datîne û bixwe diçe herema xwe, çirê vêdixe, tê cem Wetê.*

EYŞÊ

Inê, kulek vekiriye. Baranê bê, ewî nivînê te wê şil be. Gora min bike, ez ciyê te biguhêzim.

WETÊ

Na, qîza min ! Cîguhastî dibim, nikarim razêm. Çirê dayine peltikê û here razê. Tu westiyayî, kesirî, guh bide ser xwe.

*Eyşê çirê datîne peltikê, derî zirze dike.*

EYŞÊ

Me teseliya miyê ne kir.

WETÊ

Belengaza Xwedê, vê sibê da tu peritî. Here hêsa be. Çavê min dêşin, taba min ber tune.

EYŞÊ

Tu guneh î, sibê here ser hekîm.

WETÊ

Kul jî min nayê, tu here hêsa be.

*Eyşê diçe herema xwe. Wetê dikeve nav ci-nivîna, xew ra diçe.*

PERDE

# QEWIMANDINA PÊNCAN

*Mala Wetê. Şev e, lempe daxistiye. Wetê ber keviya tendûrê razaye, lê Eyşê li herema xwe ye.*

*Li derî dixin. Eyşê hişyar dibe. Dîsa li derî dixin. Eyşê çavê xwe miz dide, radibe û kincê xwe li xwe dike, tê ber derî, disekine.*

*Saw dikeve ser, sipîçolkî dibe. Derbeke din jî derî dikutin. Eyşê tirse-tirs, bi nermî xeber dide :*

EYŞÊ

Ew kê ye ?

MEMÊ

Ez im, ez im ! Derî veke.

EYŞÊ

Tu kê yî ?

MEMÊ

Memê me, Memê ! Kurê pîredemê, zavê roj û şevekê me, xerîbê hevt sala me, ji riya dûr hatime.

*Eyşê dikeve nav behra fikira û turuş nake derî veke. Xwe xwe ra xeber dide :*

EYŞÊ

Canim, dengê wî nola dengê Memê. Dibek ew be ?

*Eyşê destê xwe davê zirzê, lê turuş nake derî veke. Hezar cûre fikir tê wê.*

EYŞÊ

Canim, xêleke şevê çûye, gund pê da razaye, ev kê ye ? Na, venakim ! Eyşê xwe kerr dike.

MEMÊ

Ez Memê me, Memê !

*Eyşê dengê wî nas dike, şa dibe.*

EYŞÊ

Memê ye ! Peyayê sivikke.

*Eyşê hahangê derî vedike. Memê tê, li nav malê disekine. Eyşê zûr dibe, li Memê dinihêre û xwe davêje pêsîrê, ramûsanê didin hev.*

EYŞÊ

Teyrê bimbarek ! Serê min bigorî, emrê min bi qurban. Ba, bagerê te anî ? Eva hevt sal e, çawa em pey salix-sûlixa ketine, tukes salix ne da. Şev û roj xurê me hêsir û girî bûn. Şikir vê gavê ra tu selamet î, lo bira kirasê şevê jî min hizret be.

*Memê çav li diya xwe dikeve, dixwaze hişyarke, lê Eyşê nahêle.*

MEMÊ

Ezê diya xwe hişyar bikim.

EYŞÊ

Na, ez qurban ! Diya te guneh e, bira razê.

MEMÊ

Diya min qe ber serê min ne diçû. Min gelek bîra we kiriye.

*Memê qûz dibe, diçe serê diya xwe.*

EYŞÊ

Diya te bêkêf e, ji xewê raneke. Sibe tê, xêr pê ra.

MEMÊ

Wekî niha silavê nedim wê, ez gunehkar dertêm ber wênê.

EYŞÊ

Tu gora min bike, diya xwe ji xewnê raneke. Şev û roj ew ketibû derdê te, hêsirê çavê wê hê ziha ne bûne û çava da belengaz bûye, em herin herema min, xwe ra hêsa be.

*Memê û Eyşê diçin herema xwe.*

MEMÊ

Hespê min bikişîne tewlê û gîhê bavêje ber. Ewê min gîhand malê.

EYŞÊ

Vê sehetê ! Ev şixulê min e.

*Eyşê diçe. Memê tivinga milê xwe dispêre dîwêr. Qime û qayîşê xwe datîne ser kursî û xwe dide ser cî-nivînê Eyşê.*

MEMÊ

Ax, şikir Xwedê ra, ez sax û silamet gihîştim mala xwe. Eferim Eyşa min ra ! Şîrê dê li wê helal be. Loma dibêjin : "Eslê xas xam nabe, eslê xam xas nabe !".

*Eyşê tê.*

EYŞÊ

Hesp min kişande tewlê û nîv gurz gîha jî da ber.

Ez li te dinihêrim, tu lap hatî guhastin, belengaz bûyî.

*Keser têne Memê.*

MEMÊ

Ez çi bêjim te ? Tu haj bayê dunê çi heyî ? Ez xwe neçûme mala hêsabûnê. Bira bavkuştiyê min nekeve tora padişê Romê. Xûnxur e !

EYŞÊ

Çavê min birijin, kivş e te gelek çetinayî kişandiye.

MEMÊ

Eyşê, gula ber bîna min ! Min çiqa bîra te kiribû. Roj û şev, gav û sehet sifetê te ber çavê min bû.

EYŞÊ

Lê, tu zanî, me çiqa bîra te kiribû ? Hêsirê me bûn cew kişiyan, haqa çavê me li riya te bû.

MEMÊ

Bawer dikim. Çaxê ji zevta meriya dere, tuê çi bikî ?

EYŞÊ

Lê, name kêra çi ? Te em ji bîra xwe avîtibûn.

MEMÊ

Min hûn ji bîra xwe navîbitbûn. Ji serheda dûr name nagihîjin vir, gelek çetin e.

EYŞÊ

Min ev roj xwe ra hesab ne dikir. Şikir sax û silamet hatî, bira kirasê şevê jî min hisret be.

MEMÊ

Yazî mqedera benda, çi ser eniya meriya nivîsiye, wê wê jî bivîne. Hevt sala, gotî min cefa bikişanda. Kê bikeve ber destê wî zilamî degme sax bifilite.

EYŞÊ

Çima tu nebêjî ? Ez nizanim.

MEMÊ

Padişê Romê zû da qesasê serê me Kurdan e. Nahêle em çavê xwe vekin.

*Bawîşk têne Memê.*

EYŞÊ

Çiyayê bilind timê ser mij û dûman e ! Tu kincê xwe bêxe, bikeve nav civîna.

*Memê kinc û midasê xwe dêxe. Eyşê diçe, avê dike teştê, tîne û lingê Memê dişo û pê şalika xwe ziha dike.*

MEMÊ

Me neheqî kir, dê ji xewê ranekir.

EYŞÊ

Xwedê neheqiyê nede ! Eva hevt sal e xurê wê gir û hêsir in. Berbangê, çaxê hişyar bû, ezê mizgîniyê bidim we û bêjim :

"Hespekî boz li tewlê ye,

Zinê Erebî li piştê ye,

Hatiye kurê te Memê ye !".

MEMÊ

Kê bêşikiriya dê û bavê bike, tucar riya wan rast nabe.

EYŞÊ

Serê min qurbana serê te be, ne axir min go : "Berbangê, mizgîniyê bidim wê".

MEMÊ

Bira sozê te be. Ez qedirê te nakevim.

*Eyşê teştê dive, tê kêleka Memê rûdinê. Memê dest*

*stû ra dibe û devê xwe dike xalê sûreta, mirç-mirç paç dike.*

EYŞÊ

Delalê min, em paldin. Serê sibê der û cînar wê bên, behsa xerîbê xwe bikin, nahêlin tu pak hêsa bî. Dê û bavê Etar û Xişman timê tên, diçin. Tu haj wana heyî ?

MEMÊ

Na ! Zû da em ji hevdu qetiyane. Û kuda birin, ez haj pê tune me.

EYŞÊ

Heyfa wan, xweş xort bûn. Bira Xwedê hewara wan bê.

MEMÊ

Amîn ! Etar û Xişman cahil in, xam in. Hatina wana dûrî aqilan e, lê nêzîkî rehma Xwedê ye.

EYŞÊ

Bira Xwedê wana ya xirav xwayke ! Xêr û silamet destê xwe derê xwe xin.

MEMÊ

Cara ewilîn min birin Stambola wêran, paşê birin Şamê-Helebê. Deh roja carekê, tev hevala, em diçûn ber meçîtê, carna ber bazarê. Rojekê, em çûn bazarê, wir rastî qewala hatim. Yekê got : "Eva neh-deh rojê min e, çawa ji Kurdistanê, ji êla Casim Begê hatime. Pîrek, navê wê Wetê, lavayî kir ku salixê kurê wê hildim. Name da min. Navê kurê wê Memê ye ...". Gava wî usa got, agir dilê min ket. Ne ew e ez şa bim, ne ew e ez bigirîm. Ez xwe mikur hatim. Ewî ji paşla xwe name derxist, da min û got : "Diya te gelek ber xwe dikeve, gotiye bira nesekine, bê ...".

EYŞÊ

Ew name min nivîsî.

MEMÊ

Te nivîsîbû : "Bê av tune emr-jiyîn. Bê tav deşt û

zozan navin hêşîn. Xwe ra kûr-kûr bifikir". Agir dilê min ket, Xudê jor şehde ye ! Pey wê namê, tev sê eskera ji eskeriya Romê revîn. Sê roj, sê şev ser hev şirovekim, serhatiya min kuta nabe.

EYŞÊ

Bawer dikim. Çavên Memê xew ra diçin.

MEMÊ

Pe he !

*Bawîşk têne Memê.*

EYŞÊ

Bes e ! Em razên.

*Eyşê dikeve paşila Memê, hev hemêz dikin û xew ra diçin.*

*Sibê şebeqê, Wetê hişyar dibe, ber bi tewlê diçe, dibe firîna hespê. Wetê dikeve bin behra fikiran.*

WETÊ

Ya bi xêr ! Mêvan, mêvanê Xwedê ye. Çi ra Eyşê elam ne kir ?

*Wetê wê lehzê diçe aliyê odê, ode vala ye. Diçe aliyê herema Eyşê, li wir dibîne çawa yek di nav cî-nivînê Eyşê da ye.*

*Wetê kumreşiyê dike û destê xwe dide ser navkêla xwe, nava xwe digire û berdide, çav lê fireh dibin, nizane çi bike. Hezar hiş têne wê û xwe xwe ra xeber dide :*

WETÊ

Ecêbê wa jî hene ? Şikilê wa jî bide ber çavê min ? Gidîno, ev Eyşê ye, dû Memê ra zenda çîl-qerqaş da ber serê kurê xelqê ye ? Serê mêra şêra hunda kirine ! Loma dibêjin : "Jin dil bike, dîwar qul dike".

*Memê û Eyşê qayîm razane. Wetê qûz dibe ser herduyan, kurê xwe Memê nas nake, vedikişe.*

WETÊ

Evê çi kir ? Dilê min qul kir ! Evê forqe, delkê

namûs da bin pê. Min usa jî zanibû, kurê xelqê çav berdane bûka min, navê kurê min erdê xin. Qey min serê xwe daniye ax berê sar ! Vê jinaniya min jî mabe, ezê mirazê te çavê te da bihêlim.

*Wetê çav li tivingê dikeve, ha-hanga hil dide û bi nermî xeber dide :*

WETÊ

Hey Eyşê, Eyşê .... Stuyê te bişkê ! Te zenda çîl da ber serê kê ? Na ! Dengê tivingê bela be, xelqê pê bihese, xirav e bo navê Memê min.

*Wetê tivingê datîne dewsê. Dest davê qewza qemê, ji qalib dikişîne.*

WETÊ

Gidîno, saxbûna min çi ra ne ? Loma min nekin, dilê min diperite, dibe du kera. Êh ! Xwedê bibirre qewata jinê ye, wekî neyê kêrî vê rojê ye !

*Wetê pê her du destan qemê digire û dide ser dilê*

*Memê. Heta heye zora wê, xwe jor da davê ser qemê ye. Nalîn dikeve Memê ye, Eyşê hişyar dibe ji xewê ye. Wetê qemê ji dil dikişîne, xûn dipeke ser çavê Eyşê. Eyşê dike qîrîn. Memê di cî da dimire.*

EYŞÊ

Dayê, te çi kir ? ! Destê te bişkê ! Ne axir ev Memê ye, Memê !

*Eyşê, mîna dînan, dîn dibe, porê xwe vedirû, digirî. Wetê teze pê dihese ku wê kuşt kurê xwe û xwe davêje ser cinazê kur û digirî û dilûbîne.*

WETÊ

Memê min lawo, dayika te gura serê çiya be !

Tu hatî, çira li dê ne kir silav e ?

Eyşê, ev çi çerx û felek e ?

Min tirê Memê min xelq e !

EYŞÊ

Destê te bişkê, te çi kir ?

Te cegera xwe ji xwe cihê kir,
te min stûxwar û sefîl kir,
derê xwe dada, kilîta reş pê kir !

WETÊ

Eyşê, dilê min beroşa bêryê,
Xubar û jeng avêtiyê kewyê,
Weymîş nebe padişê Romê,
Memê min kir kuştiyê destê dê.

EYŞÊ

Rênga Şam-Heleb bi zebeş e,
Wêda tê suwarê guleş e,
Memê min suwarê bozê serxweş e,
Dayik wî ji herdu dinya rûreş e,

WETÊ

Erê, Eyşê lawo !
Memê min suwarê boz î zirav e,

Ji Şamê hat, dê ne kir silav e.

Min zanibû îşev pê ra Eyşê mêvan e.

Dayik gura serê çiya be, lawo !

*Eyşê xwe dikute, porê serê xwe vedirû û xwe jor da davêje ser cinazê Memê.*

*Wetê cina dikeve, direve derva.*

PERDE

# NAVEROK


| | |
|---|---|
| Kesên şanoyê | 3 |
| Qewimandina yekan | 9 |
| Qewimandina duduyan | 65 |
| Qewimandina sisiyan | 96 |
| Qewimandina çaran | 119 |
| Qewimandina pêncan | 144 |

**TAHARÊ BIRO** di sala 1923 de li gundê Şênkanî, Ermenistana Soviyêtî, ji diya xwe bûye. Piştî sê mehan, dê û bavê wî derbasî Gurcistanê dibin, li bajarê Tbîlîsê bi cî dibin û heta îro jî li wê derê dijîn.

Taharê Biro xwendina xwe ya navîn li dibistana bajarê Tbîlîsiyê dest pê dike. Pey wê, di sala 1948 de, kolêja pevgirêdanê diqedîne û li balafirxana Tbîlîsiyê karê teknîkî dike. Di sala 1961 de, ew xwendina balafiriyê li Enstituya bajarê Kiyêvê temam dike û heft salan weka muhendis dixebite. Piştre, bîst salan li daira Taxomêtriyê ya taybetî kar dike. Gelek xebatên wî di malhebûna gel de hatine bi kar anîn.

Ji ciwaniya xwe de Taharê Biro hez ji nivîsînê dike û di nav nivîskarên Kurdên Sovyetê de ciyê xwe yê hêja digire. Afirandinên wî bi zimanê gurcî, ermenî, rûsî, azerî û osî hatine weşandin. Pirtûka xwe ya pêşîn, "Şêr", di sala 1954 de bi zimanê kurdî nivîsî. Helbestên wî li ser antîfaşîsm, aşîtî, evîn, mêrxasî û tabîetê ne û nêzîkî ruhê gel in. Ew nûçevanê rojnama "Riya Teze" li Gurcistanê, endamê Yekîtiya Nivîskarên Sovyêtî û endamê Yekîtiya Rojnamevanên Sovyêtî ye.

Taharê Biro xwe di janra dramaturjiyê de jî ceribandiye. Wî vê pyêsê di sala 1967 de nivîsiye. Tê de xem û xeyala gelê xwe yên pirr kûr nîşan dide. Fikra pyêsê ya sereke trajêdiya dê û kur, bindestiya gel, dijîtiya şêx, pîr û begên kurd ku ji bo kara xwe li hev nayên û gelê xwe dipelixînin e. Em di vê şanoyê de dewlemendbûn û xweşikbûna cillên kurdî, taybetiyên adetên olî yên Kurdên Yezîdî, weka Pîr, mirîd (kesê di bin destê Pîr de), şems (tav), ocax (quncika limêjê) .... û awayê jiyana Kurdan jî dibînin.